**Merwan Berekat**

# WATEYÊN ÇÎKDAYÎ

**Deqine Wêjeyî**

Merwan Berekat

Wateyên Çîkdayî

Deqine wêjeyî

***

Çapa yekem – 2019z – 2631k.

Hejmara rûpelan (130)

***

Mafê çapê parastî ye.

Ne ji mafê sazî yan kesan e ku bê agahdariya nivîskar vê

pirtûkê çap an jî kopî bikin.

***

Amadakirina qabê û Çapê:
Sersera (Dr. med. Bashar Moustafa)
www.sersera.com

SerSera

**ISBN 978-3-96640-016-9**

***Pêşgotin:***

Roj bi roj pênûsa wêjevanên Kurd gulistana wêjeya kurdî ji mijarên curbecur dixemilînin. Roj bi roj geşedan û golvedaneke şewqdayî di warê helbest, çîrok, roman, pexşan û bîreya kurdî de vedibrûsin. Roj bi roj pênûsên wêjeyî çirûskên ciwankariyê di jiyana wêjeya kurdî de vêdixînin. Roj bi roj bejnên wêjeyî di qada wêjevaniyê de bilind dibin û pirtûkxaneya wêjeya kurdî mezin û fireh dibe.

Wêje giyanê milet e… Yek ji bingehên şaristaniya gel e… Neynik û pîvana pêşketina civakê û mejiyê wê ye.

Gelê Kurd di seranserî dîroka xwe de tucarî stewir nemaye, hertim ciwankar û mirovên gewre jê peyda bûne û wêjeya kurdî sêwî nehîştine.

Ji demekê ve pênûsa me jî xwest xwe di warê wêjeya kurdî de mijûl bike û destpêka wê di salên nodî de bû.

Di destpêkê de pirtir helbestê bala min kişand, pênûsa min rakêş dikir û encam komehelbestine min bi

navnîşana (Pêlek Ji Deryaya Viyanê) li sala 2002an hate çapkirin. Heft komehelbestên bo çapê amade ne.

Di van dehsalên borî de min çavên xwe baş li pirtûkxaneya wêjeya kurdî gerandin, di wê de helbest, çîrok, roman, bîre, kelepûr, destan, evsan, floklor, zargotin, pend û şîret û hin navnîşanên şano jî min xwendin. Lê tiştek bi navnîşana (Deqên Wêjeyî) ber çavên min neket.

Di van salên dawî de pênûsa min parek ji mijûlbûna xwe berve nivîsandina **deqên wêjeyî** têveda. Lê ta kîjan astê serkeftî ye yan na, bersiv li ba xwendevan, lêkolînvanên wêje û pênûsa rexnevanan e.

Yûnan û Latîniya kevnar de ji vê cureya wêjeyê re digotin: **Essai, essay**. Ango tecrûbe, telesî, ceribane. Min nav lê kir (deqên wêjeyî).

Hêvîdar im ku **WATEYÊN ÇÎKDAYÎ** bibe cureyekî nû ji wêjeya kurdî û cihê xwe di pirtûkxaneya Kurdî de bigre.

**Efrîn: 02. 05. 2016z.**

EM

AZAD

Û

NE

AZAD IN

Lê ne dîlên xewnine binçavkirî ne…

Em

Zarokên rojê…

Ji perestgehên Zagrosê ronahîvejîn in

## Mirov Dem û Jiyan e

Jiyan çi ye? Dem çi ye? Mirov dikare çi bike? Hin jî dibêjin: Ev çi pirs in? Herdu jî rast in ji ber ku mirov rastî bi xwe ye.

Hespê demê teşiya serberdayî û rehwan e… Dem rehwanî bi xwe ye. Ma gelo çi dikare demê veçengîne?! Li gor demê mirov jiyanê dihûne, lê her yek bi rengekî. Hin demê mîna Xwedê dibînin… Hin jî dem û jiyanê ji bîr dikin û li Xwedê digerin… Hin jî dibêjin: Ez dem û jiyan im… Hin jî xwe mîna Xwedê mezin û hêzdar dibînin…!!!

Dem jiyanê dihûne…

Mirov dem û jiyanê dirise

Dem bê mirov valahiyeke kor e…

Dem û mirov bê jiyanê mirin e…

Mirin dawiya dem, jiyan û mirov e…

Hin mirov bi çengelên jiyanê ve li ba dibin… Hin di gewriya demê de xwe kumişandin û xewnine li pişt sînorên dem û jiyanê dimêjînin, lê memik ziwa ne. Hin jî hebûn, lidarxistin û kumişandina wan dixin stiwê

xwedêwendan… Di pişt dîwarên perestgehan de çîrokine derewîn avis dibin.

Her mirovek ji xewnina avis e…

Xewnên gelek mirovan beravêtî ne…

Dem û jiyan ne beravêtî ne

Mejiyê mirov sedema her beravêtinekê ye, ji ber ku mirov her tişt e.

Jiyan û dem ne ji awarteyên hebûna mirov in, ne jî mirov ji awarteyên xwe ye. Her mirovek bi şêweyekî ji memikên dem û jiyanê dimije. Hin dibêjin jiyan xewn û xeyal e. Belkî xewn û xeyal parek ji jiyana mirovan bin, lê mirov jî ji xewnên jiyan û demê ye.

Carina hin tişt, bûyer û kesayet mîna demeke borî di jiyana hin mirovan de cihê xwe digrin û dibin hevalên dema wan ya niha. Mirov ji xelekên demê ye… Lê hin mirov ji berê bûyerine awarte ye.

Di navbera dema borî, niha û ya wêbê de û carina jî di navbera wan hersê deman de demeke ne mîna wan çêdibe… Tê çêkirin… Tê peydakirin… Belê mirov jî dikare demê peyda bike. Qet ne seyr e ku mirov xwe jî peyda bike û li benda demê raneweste.

Lê ne her mirovek dikare xwe bike çîroka şanaziyê û demê bi xwe re biwestîne.

Carina mirov dibe derfet û xwe datîne ber destên kesine ku derfetên jiyanê jê hatine dizîn, hîngê dem û jiyana jê tên dizîn û mîna darikê xendê tîtî jî li ser venanin.

Kesên ku li ser sifra jiyanê mîna nanekî tisî ne, mîna xewna çûkan tenê çavek li xwerinê û yê din jî ji tirsê mişt e, dem û jiyana wan çîrkeke ji destê tilîbirî ye.

Mirovên ku bi darê zorê ji balkona demê hatine êxistin û tenê di bîranînên xwe yên berî wê êxistinê de dijîn, ji berên bûyerine demeke lêvkul in. Lê jiyan berxwedan e… Jiyan ne qêrîn û hawar in… Keserkişandin korjiyan e. Mirov bi dem û jiyanê re hertim di arîşeyê de ye. Mirov arîşe bi xwe ye.

Her kesek dixweze bibe hevalê demê û hin jî dixwezin bibin beşek ji demê, lê dem ne li gor hêvî û daxwezên mirov e. Rast e; kişwera demê dêrîniya nemiriyê ye û kesek nikare wê bi paş de bizêvirîne, yan bi pêş de têvede. Lê mirov dikare her tiştî jî bike.

Dem mîna siruştê ye… Ji kesina re buhareke xemlandî ye û ji kesina re jî payîzeke zer û rût e. Lê

mirov bi xwe sedema her gunehkariyekê ye. Mirov jiyana buharî û payîzên zer peyda dike. Vêca herdiyan jî li ``bext`` vedigerînin. ***Bi bext e, lewma bi text e***. Ma gelo hiş li kû ma?! Mirov çendî seyr e looo…! Rê ji têkçûna hişê xwe re dîtine û nehatiye nasîn ku ``bext`` çi ye? Ji her tîpeke ``best`` re du wateyên xweş û xirab danîne:

**B**: Baş û nebaş.

**E**: Erênî û neyînî.

**X**: Xêr û xirab.

**T**: Têr û birçî.

Hiş karê baş dike, tiştên erênî peyda dike, xêrê tîne û jiyanê ji rastiyê têr dike. Mirov çendî seyr e looo…! Hiş ji bîr dike û bi bext bawer e.

Her kes dixweze li gor delx û meraqên xwe demê bi teşiya roj û şevên xwe birêse û bihûne. Dem bi teşiya hêvî û daxwezan netê ristin û hûnandin. Dem bi pirderî ye û ji her deriyekî re bêtirî kilîtekê hene. Kesên ku dixwezin hemû deriyên demê bi hev re vekin, li dawiyê hemû derî li pêş wan tên kilîtkirin. Ma deriyên jiyanê têne hilqerastin?!

Tê gotin:

Dem xinz e…

Derewîn e…

Xapînok û guhêrbar e…

Hin jî dibêjin:

Dem dijmin e…

Xefik e…

Pêkenok e…

Xwar e…

Dizek e…

Neyar û nêçîrvan e… Ma gelo rast e?! Mirov çendî seyr e looo… Gunehkar e û demê tewanbar dike…!!!

Carina mirov ji xwe dipirse: Ma gelo dem mirovan winda dike?! Gelo çima napirsin ji bo çi mirov demê winda dike û di pişt re hebanê lomeyan di ser de dirjîne?! Mirov bi xwe dem, bûyer, derfet, jiyan û rastî ye. Mirov hiş e… Hiş mirov û mirovatî ye.

Hin mirov dibêjin:

Divê mirov Xwedê nas bike…

Hin dibêjin: Dem bi xwe Xwedê ye…

Hin dibêjin: Dem ne tişteke û tenê roj û şev in…

Hin dibêjin: Em bi xwe dem in…

Belkî ya dawiyê rast be, lê ne tam wisa ye. Hin mirov tên dunyayê, dijîn û tam namrin. Hin têne dunyayê û pir dem di ser wan re derbas dibe, lê najîn û li dawiyê tam dimrin.

Jibîrkirin…

Hezkirin…

Şer û ceng…

Herweha xwerin û vexwerin

Perîşanî…

Dewlemendî…

Erê erê pîlan û sextekarî…

Mirovperwerî… Aştî û hemû kiryarên mirov dem in. Lê çima dem xwe di yek kiryarên mirovan de nabîne û dibe dîdevana hemû kiryarên ku ji berîkên mejiyê wî derdikevin? Ev pirs ne ji demê re ye, lêbelê ji mirov tê pirsîn.

Her mirovek li gor heza dixweze xewn, hêvî û nîgaşên xwe ji memikên demê bimêjîne. Çavên ku tenê temaşevan in, ma gelo dikarin bûyerên mêranî û lehengiyê li ser lêvên dem û jiyanê nîgar bikin?!

Hemû pirs rewa ne, lê hin bersiv dibin sedema kuştina xwediyê xwe. Mirov seyr e looo… seyr…!!!

Hin mirov li ber deriyên demê rûdinin û dixwezin derfetan pars bikin… Hin tenê temaşe dikin ku çawa derfet li wan vedilukumin… Hin teşiya valahiyê dirêsin û hin jî gunehkariyên xwe li tomargehên demê zêde dikin. Tucarî dem netê velukumandin, ne jî li pey xwe dinihêre.

Koletî ne rûdaweke nû ye, ne bê bav û dê ye û ne jî ji berê demê ye… Koletî hevcêwiya mirov e. Lê hin dixwezin wê sextekariyê têxin stiwê demê û stiwê xwe ji kovanan re xar dikin û dibêjin: Ma çi ji dest me tê der û em dikarin çi bikin?! Belkî dem wisa dixweze.

Hîngê mirov dibe dîlê ``belkî`` û li dawiyê dibe ``belkî mirov be``, yan jî ``belkî ne mirov be``. Ji ber ku ``belkî`` û demê berevaniya rastî û hebûna mirov nakin.

Bi zanîn û berxwedanê mirov dikare çavên demê ji vîn û rastiyê kilde. Her tiştê ku vedenga wî ji dervî sînorên jiyanê be, rastiya xwe cihê gumanê ye. Bersiva pirsa ku dibêje: Ma gelo bi gumanê jiyan peyda dibe?! Ne li cem demfiroş û belkîkaran e[1].

[1] - Belkîkar: Ew kesên ku jiyana xwe bi gumanan diborîne û hertim dibêje (belkî)

Bihuşt û dojeh li kêleka hev û di hembêza demê de ne. Ji ber wê jî pêwîstî nîne ku mirov di xeyalên xwe de û li pişt sînorên demê li xweşiya jiyanê bigere.

Kesên ku dibin dîlê xeyalên derewîn ne tenê jiyan, lêbelê hemû rastî jê direvin û hîngê dem wî di delavên xwe de nabîne. Kesên dîl nikarin riyan di nava demê re vekin û berve rastiya xwe rêkevin.

Mirin bûyereke mezin e, lê zû biçûk dibe. Tenê ya mirovên gewre mezin dimîne û her diçe mezintir dibe… Erê… erê; mirina bi saxî pîstrîn mirin e.

Aliyekî çemê demê tarî û yek jî ronahî ye. Erê… erê mîna çemekî diyar û ne diyar diherike. Vêca hin mirov tê de noq dibin… Hin têra xwe jê vedixwin… Hin jî têde noq dibin… Jiyana hinan ji tîbûnê zer dibe û li kenarên jiyanê tenê hawarfiroş in.

Çemê jiyanê ne bextfiroş e… Ne pêlkîn e ne jî çavdêrekî dudilî ye. Eger mirov ne nêçîrvanê derfetan be, hîngê demên wî jî mîna wî mirî ne.

Dem hevokeke ji hevokên mirov e û dirêêêêj dirêj e… Hevokeke pirwate û pîrooooz pîroz e. Lisazxistina wê ji bo mirov e. Tenê kesên jiyanhez û dempayî dikarin xal, bêhnok, matnîşank û pirsnîşanên wê

hevokê baş bibînin û her yekê li cihê wê dînin. Ma qey pêxembertî çi ye?!

Dem wêrekî bi xwe ye… Wêrekî hebûna mirov e… Mirov afrênerê wêrekî, hebûn û tirsê ye. Erê… erê mirov pêxemberê derûna xwe ye. Lê carina tirs ta golên avê jî diçeliqîne.

Ba, keviravêtina zarokekî rêwî û baskên meqesokeke koçber jî dikarin pêlan li ser dêmên golên avê siwar bikin û kenarên hilketî bilerizînin.

Tê gotin: Tirs û veciniqandina masiyan golên avê diçeliqînin û dawa kenar û peravên wê ji xewa hêminiyê payî dikin. Belkî gotin rast be. Lê belkî jî masî mezin be û ava di golê de têra melevaniya wî nake. Na; dem ne gol e.

Ramûsanek jî dikare xewna dilê evîndaran dîn û serxweş bike… Ne tenê ba, kevir û tirs, lêbelê ramûsan jî bi hêz in. Dem ramûsana jiyanê ye, lê ne her mirovek bi ramûsanan hestiyar dibe.

Eger dengê deriyekî sist, yan xurxura gewriyeke xetimî, yan jî qîreqîra şerê jineke bê guneh û mêrê wê yê nêremejî zarokan ji xewa şevê hişyar dikin. Hîngê fincên ji demê dibin bagerên xewnekirî.

Hevdîtin, hembêzkirin û ramûsanên tewşankî jî şevê diçelqînin. Ne tenê tarî, xew û bêdengî berên şevê ne... Na. Dilmestî, revandina tîbûna lêvan, helbestên dîn û bîranînên gulane jî ji ayetên şevê ne. Şev jî perestgeha demê ye. Carina şev jiyan e… Demfiroşî û mejîtarî kujerên demê, jiyan û mirov in.

**11. 12. 20013.**

# Van Çavan Çi Nedîtin...!

***Van çavan çi nedîtin...!!!***

Payîzên ku ji keskahiya merxan re çogvedan dikirin… Êvarên bi bêdengiyeke şewitî pêçayî… Pencereyên ku ji fîrefîra bayekî avis dikenîn û kulîlkên ku giriyê baranê dipelandin… van çavan dîtin.

***Van çavan çi nedîtin..!!!***

Dilên ku keziyên sêwîtiyê dihûnandin… Keçên ku êşên gustîlkan dijmartin… Xortên ku di dêmên wan de axê reng vedabû û mirovên ku dem bi gavan dax dikirin… van çavan dîtin.

***Van çavan çi nedîtin...!!!***

Dîlberên ku bîranînên wan ji xoya erdê bûn… Miltanên ku bişkovkên wan hawara rizgarkirinê dikirin… Mirina striyan li bin baranê û pênûsên ku wate vedijotin… van çavan dîtin.

***Van çavan çi nedîtin***...!!!

Ewrên ku ji demên tî koç dibûn… Tîrêjên ku di nav lêvên bajaran de likumî mabûn… Zinarên ku pişta

lehengan diparastin û nêçîrvanên kewan jî van çavan dîtin.

***Van çavan çi nedîtin...!!!***

Tiliyên ku nexşeya welatekî jibîrkirî nîgar dikirin… Herifandina salên bê buhar… Xanimên ku rengê gênim ji çavên wan dadirivî û refên kevokên ku berve rojê difirîn… van çavan dîtin.

***Van çavan çi nedîtin...!!!***

Êvarên ji xwînê vêxistî… Salên ku li ser balgiyê loman raketibûn… Derdvêketiyên ku di nav şeqên rojan de dilolijîn û sozdarên ku çerx û felek diseridandin van çavan dîtin.

***Van çavan çi nedîtin...!!!***

Meynoşên ku kêliyên kovanan vedikirin… Destbiheneyên ku li hawîrdora qaziqên daniyan lîlî azad dikirin û zendên ku bazin ji xwe dişiqitandin jî van çavan dîtin.

***Van çavan çi nedîtin...!!!***

Serserî û nokerên ku di devê diya xwe de tif ziwa kiribûn… Ramûsanên ku di argûnkên lêvan de dişewitîn… Lêvên bîran ên ku ji mêj ve negrîbûn û

mêrxwezên ku şahî diyarî pêsîran dikirin van çavan dîtin.

***Van çavan çi nedîtin…!!!***

Mirovên ku bi paş de dizêvirîn û dem zext dikirin… Semaya hingan[1] li hawîrdora kulîkên bê xunav… Pinpinîkên basksor ên ku di şewitandina xwe de hildiperikîn û civakeke ku li vedengeke dûûûr guhdar dikir van çavan dîtin.

***Van çavan çi nedîtin...!!!***

Dostên ku di nav perasiyên hev de ronahî berhef dikirin… Kesên ku ji neçarî piyala biyaniyê bi ser xwe ve dikirin… Mirovên ku çavên wan gurûzî ditemirandin û yên ku bi xwe re dipeyivîn û riya mal jî şaş dikirin van çavan dîtin.

***Van çavan çi nedîtin...!!!***

Gundiyên ku her yekî ji wan deh şoreş di sêrî de bûn… Yên ku bihneke kevnar ji xwîna wan dihat û yên ku mîna pexşana hêviyan berve sibehan rêdiketin, van çavan ew jî dîtin.

[1] - Hing: Mêşa hinguv.

***Van çavan çi nedîtin...!!!***

Memikên ku hemû veşarteyên siberoja welêt di xwe de hilgirtibûn… Pîrikên ku navika torînên xwe dibirîn û li bin dara guvîjê binax dikirin… Aşên ku li ber bê digerîn û nexşeyên ku li ber lingên mêriyan tol dibûn… van çavan dîtin.

***Van çavan çi nedîtin...!!!***

Çekdarên ku digotin: Birîna me bajarekî xweşik e… Yên ku di nav şaxên dara zeytûnê de li navê hevalên xwe digerîn û yên ku rê li pey wan dibeziyan van çavan dîtin.

***Van çavan çi nedîtin…!!!***

Gorên bê nimre û bê term… Pênûsên qurşînî û yên nîvşewitî… Malên ku bîna şewitandina wan bêfilên bajêr xetimandibûn û pirtûxaneyên ku dinalîn van çavan dîtin.

***Van çavan çi nedîtin...!!!***

Jinebiyên ku ax di dawa xwe de dibirin û li pêş deriyên gulistanan rêdixistin, ji bo ku êşên xwe tê de biçînin… Pîrejinên ku nênûk ji axa zeviyên kenok û kalemêrên ku bîna titûna Mûşê simbêl zer kiribû van çavan dîtin.

***Van çavan çi neďîtin...!!!***

Kesên ku ji siha mişkan nizimtir… Dizên zengilên dibistanan û kesên hewil didan ku nêçîra baran û xunavê bikin van çavan dîtin.

***Van çavan çi neďîtin…!!!***

Perwerên ku rengê daniştekan û vedenga tîpan di giyan û xeyala xwe de mezin dikirin… Mirovperwerên ku xuh li eniya kedkaran paqij dikirin… Şepalên ku ramûsan li ser dêmên pakrewanan diçandin û zendzerên ku sozên jiyanê diparastin van çavan dîtin.

***Van çavan çi neďîtin…!!!***

Ciwanên ku ji awirên keçan gêj radiketin… Xortên ku evîndarî li ser lêvên wan dinalî… Keçên ku bi bedewiya xwe ronahî dişuştin û destên xwe yê çepê li pişta destgirtiya xwe dixistin û digotin: Çima tu li vir mayî? Van çavan dîtin.

***Van çavan çi neďîtin...!!!***

Zavayên ku lênûsa bîranînên ciwaniya xwe bi agirê cîgarê dişewitandin… Mirovên ku berîkên xwe ji derewan dadiweşandin û bûkên ku kûpê rojan ji rondikan mişt dikirin van çavan dîtin.

***Van çavan çi neďîtin…!!!***

Pel û şaxên ku ji ezmûna bê û daran têr nedibûn… Fîstanên ku lêvên bê ji ramûsanên şermok sermest dikirin û çenteyên zamdariya derfetên beravêtî van çavan dîtin.

***Van çavan çi neďîtin...!!!***

Yên ku destên xwe di berîka axê de ji bîr kiribûn… Yên ku giriyê kaniyan birîn dikirin… Yên ku ji hestên rêdûr re gore didrûtin û yên ku govdeyê xwe bi toza riya karwanên pakrewanan pîroz dikirin van çavan dîtin.

***Van çavan çi neďîtin...!!!***

Dildarên ku di navbera mirin û tabûta evîndara xwe de qurnefîl diçandin… Mirovên ku daxwez û hêviyên xwe di çemên tengijî de berdidan… Kesên ku tarî di gewriya bagerên nevegerê de dişimitandin û dihîştin ku zinarên welêt jî bipeyivin van çavan dîtin.

Pêxemberên ku rengê sipî bi tiliya nîşanê tola ferişteyên Helebçe hiltanîn û tovên jînê li dêrîniya welêt diçandin van çavan dîtin.

***Van çavan çi neďîtin...!!!***

Romanên zamdar û yên jiyanzê… Çîrokên xemgînî û yên nemiriyê… Sirûdên perspankirî û yên hebûneke vebrûsandî… Newayên bêzariyê û yên azadiyê…. Şevên pîrkabûskî û yên miştevîn… Riyên kelemkirî û yên ji kesk rêxistî… Ahengên girî û yên şanaziyê… Rojên xeftanxalîkî û yên keskesorî… Rêweresmên bêdeng û yên bi stran û helbest…. Bilûrên nalînrêj û yên şahîvejîn… Devên konikgirtî û yên bangrût jî van çavan dîtin.

***Van çavan çi neďîtin…!!!***

Riyên ku ji gavan westiyayî… Gavên ku li ser sîngê tirsê dem vediçiniqandin… Demên ku lêvên xwe ji wêrekiya mêrxwezan gez dikirin û firkên ku xwe li pêş pêdariya zarokên rojê re dûz dikirin van çavan dîtin.

***Van çavan çi neďîtin…!!!***

Dîlanên ku li qadên şanaziyê digerîn… Govendên keç û xortên ku dilê bajaran germ dikirin û pinpinîkên ku bi agirê mûmên azadiyê xwe dişewitandin û peykerên ku bi destên lehengan dihatin rûxandin van çavan dîtin.

***Van çavan çi neďîtin…!!!***

Şîrmijên ku mirinê ji hemêza dayîkan direvandin, li tenişt riyên koçberiyê bê nav dihatin binaxkirin… Zarokên li ser lîstokên ku jê hatibûn dizîn û dayîkên ku çav di nav fêrmiskan de noq bûbûn van çavan dîtin.

***Van çavan çi neďîtin…!!!***

Şopên ku li ser dêmên axê têrxwîn bûbûn… Zinarên ku dilê wan ji serpêhateyên êşdar avis in… Newalên ku ji vedenga lorandin û sîmfoniyên êşan hîn tevizî ne jî van çavan dîtin.

***Van çavan çi neďîtin…!!!***

Sînorên wijdantevizî… Têlên ji kîndariya nijadperestên destbixwîn… Paytextên ku ji hilma xwînê sermest in û deriyên ku di pişt wan de jiyan dihate nişkekuştin van çavan dîtin.

***Van çavan çi neďîtin…!!!***

Rojên di berîkên demê de navnîşanên xwe winda kiribûn… Mirovên li pêş avahiyên kedxweran stiwê xwe xar kiribûn… Ciwanên ku bi lingên xwe pêle seriyê peykerên zordaran kiribûn û qûndeyên ku simpêlên nokeran ji mîza xwe avdidan van çavan dîtin.

***Van çavan çi nedîtin…!!!***

Mizgeftên ku quba wan ji derew û kîndariya rihdirêjan hawar dikirin… Parsekên berîkqol… Dewlemendên parsek… Bazirganên qeyrana welatê min û çavsorên ku derpiyê diya xwe li bazaran difrotin van çavan dîtin.

***Van çavan çi nedîtin…!!!***

Berpirsiyarên bi berçavkên reş û derewfiroş… Welatfiroşên ku li pêş deriyê dagîrkeran ji bo peran gilîz bi dêv diketin… Tirsonekên sola xwînrêjan dalistin û nirxên gel difrotin van çavan dîtin.

***Van çavan çi nedîtin…!!!***

Van çavan di çavên şîrmijan de Xwedê dîtin… Di çavên zarokan de werişte dîtin… Di çavên dayîkan de welatekî bindest dîtin… Di çavên pakrewanan de nameyên jiyanê xwendin…

***Van guhan çi nebihîstin…!!!***

Kirtîniya bêjeya dawî ya ku şoreşek di bêdengiyeke zivistanî de vêxistibû û zîrkezîrka kursiya nijadperestekî ku kirtîniya mirinê di gewriya wî de aliqî bû van guhan bihîstin.

***Van guhan çi nebihîstin….!!!***

Tikîniya teltîka tivingên ku pîroziya axa welêt ji xwînmijan paqij dikir… Tepetepa gavên şoreşgerên ku di ser nexşeya pîlanan re gav dikirin… Qêrîna şoreşgeran ya ku dilê dijminan diqetand û şîrqîniya sîleyên ku tundrewan li nav çavên xwe dixistin van guhan bihîstin.

***Van guhan çi nebihîstin…!!!***

Hawara jinên Nûraniyan ên ku ji hêlûna mirovatiyê hatibûn revandin… Vedenga sonda berxwedêrên ku xwîna xwe ji bo nifşên siberojê di nav lêvên axê de dirjandin… Lorandina dayîkên ku bi destên xwe agirê şewitandina landikan vedimrandin û banga zarokên ku di ser cendekê diya xwe de fêrmiskên sêwîtiyê dibarandin van guhan bihîstin.

***Van guhan çi nebihîstin…!!!***

Fîzîniya qurşînên ku keriyên berazan ji peravên Dicle û Ferêt berve fêzên wan bêl[1] dikirin… Mirqemirqa ramûsanên dilsoziyê… Gurmegurma daholên

[1] - Bêl: Dema ku pezinî ji keriyekî pêz vediqetînin dibêjin: Bêlek pez veqetandin. Pez bêlbêlî bû. Anngo pez bû çend beş. Min pez bêl dikir. Ango min pez ji hev veqetand.

serfiraziyê li qadên gund, bajar û bajarokan û awazên sîmfoniya sirûdên şanaziyê jî van guhan bihîstin.

***Van guhan çi nebihîstin…!!!***

Nalînên ku di gewriya çerx û felekê de guhên serdeman seza dikirin… Sirûdên di navbera erêd û ezmên de awazşewitî dinalin… Dengê êskînka ewrên ku ziwa li ezmanê welatê me diteşîn jî van guhan bihîstin.

***Van guhan çi nebihîstin…!!!***

Di bergeyên kulîkdayî banga birînên axa welêt… Vedenga çîkdana nexşeya siberojekê ji pertavên rojê dihatin hûnandin… Helbesta giyanên ku ji memikên vîndarî û pêdariya dîrokeke lorandî dimêtin û dengê çîrokên zîldana hebûna me jî van guhan bihîstin. .

***Van guhan çi nebihîstin…!!!***

Dengê jiyanê yê ku ji sirûd û kenê axê… Qêrîna şervaneke vînkurdoxî… Awazên gav û cirîda hespên Mîdiyên rojperest û şîrqîniya birûskên nîvbuhareke rast jî van guhan bihîstin.

***Van çavan çi nedîtin…***

Van guhan çi nebihîsti…!!! Çiyayên ku berîkên ji çîrokên lehengiyê avis in di nav lêvên wan de tîrêjên ronahiyê bê perde çîk didin… Stêrkên ku di ser navika çerxan re têr gav kirine û li peravên çeman bedewiya jiyanê belav dikin… Belê van çavan dîtin.

Piştî çîroka xewê ya piiiir dirêj… Destaneya berbangê bi zimanekî ne kedîkirî çîk dide û dem bextewar şax dide… Erê van çavan hertişt mîna xwe û ne wek xwe dîtin.

Di pir serdeman de keçên Zagrosiyan bi lîliyên şanaziyê hespên kumêt pêşwazî dikirin û bi guliyên xwe yên zerîn rimên siwaran xelat dikirin… Îro jî kezîsorên Kurmancan bi tiliyên xwe yên nîşanê dilîlînin û rastiya sîwarên bê di awirên rojê de nîgar dikin… Erêêê… erê van çavan ku çawa qadên azadiyê hemêgerm û bergexemlandî ne.

Girêkên dêrxûna demên mirûzqurmiçî têne vekirin… Zinarê di devê felekê de tê şikandin û dîwarên ji kevza serdemên xapînok têne çirandin… Dengê wê şikandinê û wê çirandinê van çavan dîtin û van guhan bihîstin.

Di landika Mezobotamiya de tajana jînê di sanciyên jidayîkbûnekê de ye û newqên demê di kilkila asoyekî dawîfirk de ne… Rengên kovan û keserên zingargirtî ji sîngê sibehan tê damalandin û rengên xalîkî ji çavên zarokên rojê hatine avêtin… Erêêê… erê jiyan çîk dide, dijene û baran e baran.

Ewrekî mîna xwe ji xunavê avis, ji baranê têr û ji birûskan çarcanî[1] buharekê li welatê rojperestan dimêjîne… Ronahîperest ji hêlûna jînistanê dipijikin û bihna axê hilma jiyanê ye… Xunav e, baran e…

Xwezî baran veneke û hertim em ji rengê berbangê û giyanxunavî ne… Axa Kurdonîsê di hebanê tîbûna serdeman gelek xewnên tî mêjandin, lê zarokên wê fêrî tîbûn û ziwabûnê nebûn. Belkî carina ji Dicle tê pirsîn: Çima tu di tîbûna xwe de diherikî? Belkî ji Ferêt tê pirsîn: Çima tu şemaqekê li nav çavên bêwijdaniyê naxînî û dilbikînan di gewriya xwe de noq nakî?

Hinan pirsîn, hin dipirsin û hin jî dê bipirsin çima tîbûna serdeman dirêj bû? Heeey hey serdemine berziwa bi deziyê kînê hatine dirûtin!! Îro çav dibînin ku çawa tarîperest di gola tarîperestiya xwe de dêris

[1] - Çarcanî: Bi çar canan.

dibin. Erêêê… erê guh dengên qetandina kêliyên kînperestan dibihîsin…

**17. 11. 2013**

## Mirov Seyr e Looo!

Ferişte bi bask in û heft ezman jê re vekirî ne, bê sînor û bê bend in… Ferişte li heft ezmanan azad in, tenê Xwedê serwerê wan e. Vêca çawa azad in?! Hooo mirovo çendî çîrokvan î looo!?

Çîroka serweriyê dirêêêj dirêj e… Nikê[1] teşiya hûnandina afirandinê ji xeyalên mirov e. Hebûn, zindîbûn û vejîna xwe bi destaneyeke xeyalê ve girêdide. Mirov ji xeyalê têr nabe… Çendî seyr e looo…?!

Heft erd… Heft ezman… Feişteyên bi bask, lê xuya bû ku bê Pêrî nedibûn. Ferişte bûn serwerên Pêrîan. Pêrî jî li kursiya serweriyê gerîn…! Vêca divê zindiyine ji ferişte û Pêrîan nizmtir hebin! Kursiya serweriya bilind e û divê giyanewerine astnizim[2] hebin. Vêca mirov wisa dibêje…!!! Adem çîrokeke bi mij û dûman e… Belkî jî çîroka xeyalê be û hîn jî bi dawî nebûye.

Ferişte bê bejin in… Netên dîtin… Naxwin û venaxwin… Ne dizên ne jî vedizên… Hin dibêjin: Bi dê

---

[1] - Nik: Hesinê bi serê teşiyê ve.
[2] - Astnizim: Asta xwe nizm e.

û bav in. Heft in… Pir in… Ronahî ne… Yek jî tenê ji bo mirinê ye. Ma dibe ku ronahî kujer be?! Pirs rewa ne û bersiv jî li gor pirsê rewatir in. Em mirov in ha.

Pêrî carina tên dîtin… Belkî xwerin û vexwerina wan jî taybet bin… Tê gotin ku pir in, lê bi çi zimanî ji hev hez dikin nehatiye gotin…! Navê welatê wan çi ye û bazarên wan çi ne? Ne diyar in. Çendî mejiyê mirov xeyalhez looo! Pêrî nedîtine û ji hev re dibêjin: Tu mîna Pêrîan î…!!!

Zindiyine bi bejin, dixwin, vedixwin û dizewiPêrî li ser navika gozemînê hatin afirandin. Vêca çawa û cima li piştî ferişte û Pêrîan hatin afirandin?

Mejiyê mirov Xwedê, ferişte û Pêrî nas kirin û çîroka afirandinê li ser zimanê xwe diherikîne û hîn jî çîrok bi dawî nebûye. Ferişte bi bask in… Pêrîên xwedêhez bi bask in û yên ku ne xwedêhez bê bask di nav gozemînê de diwestin û riswa dibin. Vêca çima mirovên xwedêhez ne bi bask in?! Mirov çîrokvanekî seyr e looo…!!!

Hahûûû… hahû çîroka afirandina mirov ji ya roj û şevê dirêjtir e… Ji ya feyrişte û Pêrîan sertir e û carina hiş jî şêt dimîne ku çawa çîrok hatiye ristin.

Adem ji axeke tirş, şor û şêrîn hatiye afirandin… Ma gelo lewma hin mirov bê hest û mirûztirş in… Hin peyv şor û bê ber in û hin jî xwînşêrîn, nazik û bedew in?!

Tê gotin: Ax jî ne razî bû ku mirov jê peyda bibe…!!! Ax razî nebû û sê ferişte Cibrayîl, Êsrafîl û Mîkayîl poşmam vegerîn. Vêna feriştiyê mirinê ``Canêstîn`` ax anî zorê…!!! Adem ji axê û Hewa ji Adem hatine afirandin…! Çîrok dirêj e û li ser zimanê mirov tê gotin. Ma gelo mirov ne seyr e?! Gelo çawa û bi çi zimanî axê nerazîbûna xwe diyar kir û çawa ``Canêstîn``bi zorê ax razî kir?!

Ezazîl, Iblîs, Şeytan û Îbine tev navên serwerê feriştan e. Tê gotin erê erê mirov dibêje: Sê caran deng bi Şeytên ket: *Roja ku nefret lê hat. Roja ku ji ezmên dagerî erdê. Roja ku Mihemedê Qerîşdaxî bû pêxember.* Mirov çendî seyr e looo…!!! Vêca serkeftinên wî jî dibêjin: *Dema ku Adem ji wê darê xwer û ji bihuştê hate avêtin.*

Di ber şer, nebaşî û hemo xirabiyan de tewanbar û gunehkar e. Dîsa çîrok dirêj e. Mirov cot dike… Rezan diçîne… Tirî diguvêşe… Peyalan ji meyê dadigre… Şingîniyê pê dixîne û şerxweş dibe. Vêca mey ji karê

Şeytên e! Birayê xwe bi destên xwe dikuje, di pişt re poşmam dibe û dibêje: Şeytên ez şaş kirin. Mirov çendî seyr, seyr û seyr e looo…!!!

Mirov her tişt e… Dikare her tiştî bike… Mirov afrênerê xwe û tiştine din e… Kê Xwedê nas kir? Kê nav li Xwedê, ferişte û Pêrîan kir? Kê çîroka mirov bi axê ve girêda? Kê pîrozî diyarî axê, avê, bê û êgir kir? Kê pêxembertî kir? Kê zagon û dad li gor serdeman danîn? Çendî pirsên weha hebin, bersiv MIROV e.

Kê Roma şewitand? Kê hîşt ku dîwarên şikeftan bipeyvin û dîrok nivîsî? Kê xwîn rijand û ax bêzar bû? Kê nav li pirtûkên pîroz kir û ji xwe re destûr danîn? Kî jînistanên buhştî dişewitîne û dojehê lê peyda dike? Kî bergeyên goristanan fireh dike û hemû sedemên mirinê rast û ne rast dinirxînin? MIROV E… Mirov.

Mirov dilovan e…

Nazik û bedew e…

Jînhez û hestzîz e… Zanîn û ronahî ye…

Hebûn, jiyan û rastî ye. Lê ne her mirovek.

Mirov çavteng e…

Dilbikîn û zikreş e… Keysebaz û talanker e…

Mirov xwenas û xwenenas e jî.

## Em Ji Afrandina Rewşên Xwe Ne

Her tiştekî kelûpelên xwe kom dikirin û berve dawiya xwe direvîn… Ba tiştên sivik bi revandin dide… Ro xewnên tariyê têwerî gewriya wê dike û di navika riya revê de kaban dişkîne… Em ji afrandina bayê xwe ne…

Zarokên rojê pirtûk, lênûs û pênûsên xwe li hawîrdora xwe rêdixînin… Pirtûk çîkdana hebûnê ye û bê welat hebûn çîk nade… Lênûsa bê çîkdana nayabdariya wî peline vala ne û dibin çîrokine ji tinazên bayekî bê nasname… Pênûs; erê erê pênûs çîkdan e… hebûn û afrandin e…

Pirsine ku ne di serê tu kesî de bûn, me avêtin bergeyên rojemêra ahengeke bêzar. Em li ser kîjan xewnê têne avakirin û bi çi rengî emê bibin dema xwe?

Çendî bi êş e ku stêrk di destpêka hilata xwe de rastî hesareyên rengxalîkî werin. Nediyariyên di devê demê de kûr dibe û bihna şewatekê jê tê… Em ne ji bihna şewata çîrokine şewitî ne. Belkî her tiştek li berê guhartinê be... Her giyanewerek li ber koçkirineke ji nişkê ve be û her pirsek di rewşa giriyekî

sor de be. Lê mirina solîn û perperîkan ne gunehê bayekî ji nişkê ve ye. Mirov bûyera her rewşekê ye.

Li ser sîngê dîrokê welatek û xewneke ku netê dawîkirin hiltê. Per û qebqeba kewên ku di siha şikêran de mezin dibin, nikarin têriyê sar bikin… Sih û têrî li hev nabanin… Têrî[1] bi sihê dilîze, carina wê dirêj dike, carina jî kin dike û li dawiyê di parzonê pûçbûnê re derbas dike… Em ji afrandina têriya xwe ne.

Gozemîn mirî bû… Vêca çima û çawa hate vejandin û zindî bû? Bersiv di ferhenga royê û zarokên wê de ye. Li Zagros, Mezobotamiya û dîdevaniya Ferêt û Dicle vegerin.

Aliyekî dîrokê tozgirtî ye… Aliyê din jî tabloyekî rengşimitî ye. Em ne ji afrandina rewşeke vedizok û awarte ne… Dîrok jî bi berîk e… Berîkine wê wargehên kufikê ne… Berîkine wê serada rastî û nerastiyê ne û hin berîk jî qol in. Em ji afrandina dîroka xwe ne.

Di navbera me û xewneke ku siberoja wê çem in û semaya agirekî ku rewşên jiyanê dalêse de hebûn in.

[1] - Têrî: Ro. Pertavên royê.

Hebûn ne xewn e… Xewn ne guneh e… Gunehê mezin ku hebûn bibe xewn û balgiyê rastiyê vePêrîiqe.

Bahozine hêrsvedayî ji berê rastiyê ne… Bila dîrok loman ji xwe bike…

Em ji afirandina rewşine vêxistî ne…

Em vêxistî ne…

Em vêxistin in…

Avdar zîldan e, ahîziya[1] demsalan û xuncevejîn[2] e…

A: Av, avzê û agirê ahengan e…

V: Vejîn û vîn e…

D: Darbişkuvîn[3], delavherkandin û derbûn e…

A: Anahîta, Farona û Nazatiya[4] ne

R: Ronahî, rêweresim û rojhilat e… Semaya siruştê li çiyan e …

Em ji rewş û afrandina Avdarê ne… Diyako[5] valahiya dîrokê dagirt… Kawa şewq da quncikên tarî…

---

[1] - Şahîzê: Şahîherikandin. Mîna (avzê).
[2] - Xuncevejîn: Vejîna xunceyan. Xunce: Solîn, gupik.
[3] - Darbişkuvandin: Bişkuvandina daran.
[4] - Anahîta, Farona û Nazatiya: Navên xwedêwendên Kurdan in.
[5] - Diyako: Şahekî Mîdî ye. Wî li hember Aşûriyan Kurd kirine yek.

Farona[1] bi toza li ser deriyên perestgehan çavên kujeran kor kirin… Em ne ji malzaroktiya nalînê ne…

Talan nasnameya hin serdeman e û talankeran bergeyên kovan, derd û kuştinê fireh dikin… Adariyan staran û sirûdên şanazî û jînê diyarî mirovahiyê dikirin… Bûyer ne ji mêj e, şûrê leşkerekî Sirbiyayê ahengên gewre li dar xistin.

Lehengên ku di perestgeha bapîrên xwe yên dilsoz de fêrî nimêja berbangê bûne, bi çavên xwe digerin, bi rengê xwe qadan dilgerm dikin û lîliyên şanaziyê li ser zimanê dayîkan rizgar dikin. Belê; di siha biyan de pîvaz jî zîl nadin.

Ji mêj ve zarokên royê ji memikên şahiyê nemêtine… Dem ji herikandina birînên nekewandî têr westiya û riyên ku diçin ezmên ji lavêjan hatin êşandin. Li peravên rojgirtinê û pirsên raketî kulîlk venabin. Ma qey tinaz û rastî li hev dicivin?!

Stranên ne sindifkirî… Golvedana deng û vedenga sirûdên di paşela berbangê de payî û rêweresmên asoyekî rengvekirî dibin pêlvedana siberojeke jînistanî. Em ji afirandina şewqvedaneke dêrîn in.

[1] - Farona: Xwedêwendeke Mîdî ye.

Wek destpêka semayeke ku jiyan bi dawîbûna birîneke şevane dikenand, em nayabdarine ji rengê axê û govdeyê bajarine xewinkesk in. Mîna stêrkên li ser eniya ezmên ronahiyeke vêketî ne

Bêzariya ku hest berve dawîbûnê dipişikandin… Nediyariyên ku di giyanê me de kolanên windabûnê vedikirin, Îro bûne xaliya pûşê payîzeke xapînok… Em rêwiyên di riya ronahiyê de ne…

**Efrîn: 02.12.2014.**

## Pirs û Xwîn?

Kê û çi hîştiye ku tirseke nîvqurçî di hindurê me de mezin bibe? Çima her yek ji me bûye bajarekî xewkirî û qêrînên me li dîwarine bê guh vedipekin? Dibe ku li bersiva pirsên xwe digerin… Dibe ku em beşek ji bersivê bin… Dibe jî ku em bersiva pirsên kesine din bin. Vêca çima em xwe nabînin?!

Hebûna me… Nasnameya me… Jiyana me… Pirs û bersivên me jî tev bûne pirs. Vêca her yek ji me bûye bersiveke nîvwindayî…!!! Na… na em ne windayî ne… Gavên me ji giraniya pirsên bê bersiv tên windakirin.

Em pirs in…

Bersiv in…

Windabûn û lêgerîn in…

Rengavêtî ne û li rengine din digerin

Em çavdêrên tiştine veşartî ne

Hin jî çavdêriya hebûna me dikin

Lêgerîna bi zimanekî sindifkirî… Pênûsa ku ziman di gewriyê de kumişî… Çûyîna di riyên çavkor de… Gavên ku bi tariyê alandî û sergerimiya li hember hev

em kirine pirsine di nav hev de û bersivine hinc[1]. Vêca em dibêjin çima rê likumandî ne û em rastî xwe netên û çep û rast di hev re derbas dibin?

Kî û çi dihêle ku bêje li ser zimên sînorkirî xav bin û wate ji hevokan birevin?! Çima em ji rengê xwe narijin û ji rastiya xwe nameyin? Çima rewşa me barîneke ji pirsan e?

Em ji çavikên demê derbûn…

Golvedaneke ji berê Zagros in…

Rojperest in ha…

Hîn tîna simên hespê Şoştar li qadên welatê rojê sarnebûye… Lêvên vê xakê ji xwîna pakrewanan ziwa nebûne.

Deşta raniya…

Geliyê Zîalan…

Paşela geliyê Gênco…

Peravên çemê Sablax…

Bixçika qada Çarçiran…

Sînema Amûdê…

Newrozên dembixwîn…

---

[1] - Hinc: Tevlehev, ne lihevhatî. Nimûne: Çima te porê xwe şeh nekiriye û hic hîştiye?

Avdarên duriwî[1]…

Gelî, newal û sîngê çiyayên Berzaniyan…

Deryayên bi zînadan…

Welat di ser westandina xwe de tê herifandin… Ma gelo dibe ku em hertim êş û birînan nenî û lele[2] bikin?! Jiyan ne dergûş e… Tepkirin û lelekirina mêjî pirseke mezin e. Carina dîwarên çavgirtî û komên keviran jî nêr dipeyivin. Ma qey tolvedan mejîkorî ye?!

Hêviyên zarokan Memo, Casim, Serkîs û Andonyan di hekîpê biyaniyê de winda ne. Ma xwîna we ji gilîzê serdemên xwînî têr nabe? Ev çi serdem e looo… Vêca cîhana pêşketî heye?!

Şaşikgewr in[3]… Hin jî şaşikreş in[4]… Çi seyr e loooo! Ji pesna şûrên zingargitî û ji serxweşên meyxanan serxweştir in. Erê… erê piyalxwînî ne ha. Vêca dozbuhşt in…!!! (***Heft caran hilweşandina Ke`bê[5] çêtir e ji xwînrijandina mirovekî***). Vêca derewan li pêşengên xwe jî dikin…!!!

---

[1] - Duriwî: Bi du riwan.

[2] - Lele: Ji xewa zarokan re tê gotin. Lele bike, ango bila xew ke. Lelekirî ye, ango xewkirî ye.

[3] - Şaşikgewr: Oldarên misilman ên ku kofiya wan ji cawê gewr e.

[4] - Şaşikreş: Oldarên misilman ên ku kofiya wan ji cawê reş e.

[5] - Ke`be: Mala Xwedê ya li bajarê Mekê.

Dilbikîn in…

Çavteng û talanker in…

Xwînrij tundrew in…

Derewîn û mafxwer in…

Çavsor û terorîst in… Bihuştê dikin dujeh û dibêjin: Em leşkerên Xwedê ne!?!? Ev çi derew e looo? Eger na, çima hatiye gotin: {وجعلناكم شعوباً وقبائل لتعارفوا؟}

Xwînrijandin li heza wan hatiye.

Birîn birînan vedireşînin û li paytexta ezmên jî xwîn dibe daxeke xwînî çi bibêjim looo?!

Têrê nakin gotin ne jî peyv

Çîrok û destaneyên xwînî

Çêja zimanê Xwedê jî kirin xwîîîn... xwîn û dîsa xwîn...!!!

Kuştin...

Golvedana xwînê...

Şuştina şûran bi xwînê...

Bêfilên çavsoran... Dîrokxwînên xwînşîn têr nabin ji hilma xwînê.

Li ser vê xakê...

Vê gozemîna sar û germ gelek caran gihîştin hev pir pêxemberên derewîn û hîn xwîn diherike xwîn, xwîn û xwîn...!!!

Seyr e mirov?

Hin dibêjin: Erê

Hin dibêjin: Na

Hin jî mîna mirovan in û jiyana wan xwîn e, xwîn û xwîn.

Peyvsor in...

Zimanîn in...

Bihinxwînî ne... Mejîkor in; xwînrêj in... Sooor... û dîsa xwîn, xwîn û xwîn.

Laboda xwen e? Belkî jî çîrok be. Lê jêmayên Qayîn hîn jî xwînvexwer û xwînreş in... Xwîn, xwîn û dîsa xwîn...!!!

Di nav xwînê de şopedarên xewnên xwînî û hertim qayînîperest bê xwîn û şopxwînî ne... Xwîn, xwîn û xwîn...!!!

Mirov in....

Hov in....

Belê herdu jî giyanewer in...

Bi tamar, dil bê xwîn in...

Çima vePêrîiqandin?

Pir baştir e hov

Ku kujer û xwînî be

Nijadperest, talanker û bê wijdan be mirov.

Li pêş deriyên perestgehan ji bo xwedêwendan...Bi navê gelek cejnan û carina jî bi navê evîndariyê herikandin xwîn, xwîn û xwîn... Vêca jê re dibêjin mirov...!!!

Tozfiroş kî ne? Kîn ji mejiyê tozperestan e. Ev xak di nav westandinê de xwîn digrî... Dengê zengilên kuştinê vedenga giyanên bêguneh e û sibehên Rojhilata gunehpîr  mirûzxwînî ne... Xwîn, xwîn û xwîn...!!!

Ma dojeh heye? Pir li ser wê hatiye gotin û di mejiyan de hatiye dotin ku dojeheke ne diyar heye... Çendî seyr e mirov looo! Bi rêtina xwînê bihuşta xwe dikin dojeh û di nav xwînê de li bihuştê digerin...!!!

Dizên ku lîstokên zarokan bi girî dikin… Kujerên jînê bi mejîxwîniya xwe şad dibin… Lêvên axê ji xwînê şor dipeyivin û mejîkor bi sorbûna çavên xwe serbilindiyê doz dikin. Xwînîperest in û xwînê dirjînin… Vêca hin kes jî dibêjin: Xwedê dê tola me bistîne!!! Ma karê hişê we çi ye looo?!

Çiya jî biryara pakrewaniya xwe didin û qêrîna wan dibe hîrehîra hespê pêxemberê tolvedanê û tirsê dixin dilê çeqelên dizek.

**18. 02. 2013.**

## Mirin

Jiyana bi tekane mirin e… Derûna ku dem û jiyanê di landika gumanê de dihejîne; mirin e… Mirovê ku tenê ji bo xwe heye; mirin e… Mirov bi xwe çîroka jiyan û mirinê ye.

Mirov dijî ji bo bimre… Mirov naxweze bimre… Naxweze ji xwe koç bike û careke din wek xwe yan ji xwe çêtir venegere.

Du mirin nagihînin hev û di hev de namirin. Lê derûna nexweş û gumanperest gelek cureyên mirinê peyda dikin, digihîne hev û li dawiyê xelata wan mirina rastî ye.

Mirov im…

Bi hêz û bi hiş im

Dikarim gelek mirinan têk bibim

Dibe jî ku hebim û gelek mirinan têk biribim.

Mirov in û li gor vê wateyê zîl bidim, hîngê ber jiyan e. Mirovê ku berê wî jiyan be… Jiyana wî ne tenê ji bo wî be, hîngê di ser gelek mirinan re gav dike û her gavek dibe zîldana jiyaneke nû.

Mirov hin tişt û her tişt e… Belkî jî serûberê hebûna wî nakokî bin û hertim bi mirinê re di arîşeyê de be.

Jiyan arîşe ye…

Mirov bi derûna xwe re di arîşeyê de ye…

Bi hebûna xwe re arîşedar e…

Erd û ezman

Hesare û siruşt

Hemû zindî û mirov bi hev re jiyanê peyda dikin, lê bi hev re namrin. Li her gundekî û li her bajarekî goristan hene. Mirovên ku li gerdûnê jiyanvejîn in gor nabe dawiya wan û hertim dimînin.

Stêrka ku ji ezmên dipijiqe ne ya tu kesî ye ne jî nişana mirina giyanekî ye. Ronahiya hemû stêrkan ji royê ye û ro namire. Berge tiştekî pîroz e… Bê berge ro dê her tiştî bimrîne. Rûber tiştekî pîroz e… Bê rûber jiyan peyda nabe û hîngê mirin e.

Mirovê ku hertim bi mirinê diponije hestên wî… Jiyana wî… Rûber û bergeyên ku tê de dijî tev mirî ne. Vêca ji bo çi ji mirina xwe ya dawî ditirse?!

Mirina hin mirovan geşbûna jiyanê ye… Hebûna hin mirovan mirina jiyanê ye.

## Siha Welatekî

Xwezî welat ne di mejî, dil û giyanê min de ba. Welat ne tenê av, kevir, dar û tişt in… Xwezî em tev welatek bana û bê welat bana.

Xewnine payî…

Meraqine hişyar…

Demine dudil…

Hestine di lêgerîna hebûneke windayî de…

Vedengên ji gewriya bangeke bê deng…

Rê… Wek marine kor xwe li bejna welêt alandine. Gavine bi şûn de û pêş de bi siha xwe mijûl, xulmaş û nîvrevok in.

Kê nav lê kir welat?

Çima nabe welat?

Hatime ristin… Tême hûnandin… Çima tevneya welêt tê veçirandin, vereşandin û bersiv li xwe digerin, digerin û digerin? Ez welatê xwe me… Welat ez im… Welat ne bazar in.

## Pesin û Lêborîn

Pesin têkçûn e… Têkçûn dawiya mirov e. Belê wisa tê gotin. Lê ne hertim gotinine rast û durustin.

Gul têne pesinandan, bi wê pesnê geşbûn û bihna ji wan nareve. Ma pesin gulan diçelmisîne?!

Kesên ku nizanin an jî nikarin pesna gul, nêrgiz û qurnefîlan bidin, kesine hişqaling û hestêkçûyî ne. Xwedê afrêner e û hemû xwedêwend pesindarê wî ne. Ma gelo mirovên afrêner û nayabdar nînin?!

Zaredeşt ronahîperest bû û tarî bi revandin da… Kawa li ser pişta kela zordariyê agirê azadiyê vêxist… Çend Kurdan şîrmijê Meryemê ji Daryos parastin û Îsa bû pêxemberê aştî û perweriyê… Evîn Feqeyê Teyran Sinem ji mirinê hişyar kir û çemê Miksê dîdevan e…

Mirovê ku pesna kesên zana nede hevalê tariyê ye… Pesna li piştî mirinê ne tam rast e. Wek heye bibîne û li gor rastiya her kesekî rast bibêje. Pesin ne têkçûn e. Ma ronahî bi pesnê têk diçe!

Pesna bedewî û xwşikbûnê tê dayîn. Çavên mirovê hestzîzî, bedewî û xweşikbûnê dibînin. Ma gelo çêdibe

ku mirov zimanê xwe fêrî pesna çelengî, xweşikbûn û bedewiyê neke?!

Her tiştekî baş, rast û durist cihê pesindariyê ne. Av jiyanvjîn e… Ba jiyan bi xwe ye… Azadî hêvanê jiyaneke rast û durust e… Jiyan û gerdûn bê ro tarî ne. Ma gelo çêdibe ku mirov pesna siwarên bê ned?! Me gol çêdibe ku pesna ramanên ronahîbarîn netê dayîn?! Ma gelo çima mirov dê ne pesindarê kesên ronakbîr be?!

Ez baş tênagihêm…

Ez şaş dikim…

Ez ne bi qaserî filan karî me…

Hîn nebûme helbestvan…

Hertim lêborîna xwe ji kesê li hawîrdora xwe dixweze…

Ne guneh e ku mirov tê nagihê, guneh ew e ku hewil nade têbigihê. Eger mirovê têgihîştî tenê ji bo xelk jê re nebêje pesna xwe dide, hertim dibêje: Ez tênagihêm, hîngê gunehê mezintir ew e.

Dikare filan karî bike û tê de têgihîştî ye, lê derûna xwe li pêş nezanan nizim dike. Tenê ji bo xelk jê re

nebêje: Hesino xwe pesino…!!! Tenê derûna nexweş bi pesnê têk diçe

Xwendevan, rexnevan û wêjevan jê re dibêjin: Tu helbestvan î. Vêca xwe berkenî dike û dibêje: Na... na hîn ez ne helbestvan im. Mirovê hertim neyînî xwe dinerxîne û pesnê nepejirîne hawîrdora xwe fêrî neyîniyê dike. Ne hertim û ji bo her kesî gotina: ***Hesino xwe pesino*** rast e.

Di destpêka gotinê û dawiya wê de ``biborîne``. Eger tu rast, durust û wek heye dibêjî, vêca bo çi lêborînê dixwezî? Lêborîn li piştî şaşbûnê erk e. Vêca çima berî dengkirinê lêborînê tê xwestin? Li piştî şaşbûnê lêborîn mezinbûn û zanebûn e… Biçûkbûn e ku lêborîn tenê nerêt be.

## Siruşt

Di her tiştekî sirûştê de pareke xweşik û cudawaz ji Xwedê û ji mirov e… Di her xweşikbûnekê de awêneyeke diyar û yek jî ne diyar hene. Mirov awêneya xwe ye… Siruşt bo mirov nîvawêne ye. Siruşt giyan e.

Giyan dêşe…

Dinale û digrî…

Bi bindestî û zordariyê…

Bi şahî û azadiyê hestiyar dibe.

Siruşt jî giyan e…

Daristan û gulistan jiyan in. Şewtandina wan jiyankujerî ye. Jiyan bi xwe giyan e.

Meqesok…

Kevok û hechecok…

Kew û baz ji balindeyên jiyanê ne

Nêçîra jiyanê nêçîra siruştê ye. Eger mirov tenê ji bo xwerina goşt li balindeyan binihêre, ma gelo çi wate ji mirovatiyê re dimîne?! Parastina sirûştê mirovatî ye.

Sirûşt ne ji berê sistemeke tewşankî ye… Kanî û çem di rêwîtî û herikandina xwe de awazan diyarî giyanewerên zindî dikin û vejîna bergeyên jîndariyeke rengîn in. Qirêjkirina gewriya çem û kaniyan jinkujerî ye. Çem, kanî û derya giyan in.

Çiyayên lêvên ewran bi ramûsanan serxweş dikin û ji damarên bejna xwe jiyanê di kunê gozemînê de didoşin. Ma gelo çêdibe ku bermayên kujeriyê di dilê wan de werin veşartin?! Mebêjin çiya bê giyan in.

Bila agirê sor…

Agirekî ne vemirandî…

Agirekî tîndojehî bi bedena jînkujer, siruştkujer û giyankujeran keve û hertim zindî bişewitin. Carina agir jî parêzvanê jiyanê ye û giyan e.

## Gulistan Bi Rengên Xwe Dixemile

Keznîfon ne derewîn bû… Bi Skenderê Mezin bawer bû… Li sînoran vendilikumîn… Leşkerên wan dibûn golvedana talankeriyê û li ser sîngê gozemînê vedizelîn. Li pişt xwe dihîştin derya, çemên mezin û berê hespan dan çiyayên ku vîna wan gelek caran dîrok veçengandine.

Skender xwe ji bîr kir û got: Ez Xwedê me…!!! Vêca Keznîfon û serbazên wî bi xwedêtiya sergermiyê Megdoniya bawer bûn! Eger mirovekî doza xwedêtiyê kir, ma gelo çi nav li bawermendên wî dibin?!

Ji hemêza êvarên Zagros siwarên royê derbûn û leşkerên Skender ji ser pişta hespên dûvrût vepekandin… Pêlên tirsê di çav û dilê Skender de li hev alandin. Bersiva Siqarat hîşt ku ta rûsipiyên Megedoniya jî li wesekên xwe vegerin.

Girêka ku di gewriya dîrokê de hatibû veşartin Diyako bi diranên vîneke têrkeyandî vekir. Ma çi hîşt ku agirê rizgariya bindestan li ser eywana Nînewa vêkeve?!

Li ser vê xakê pir çavsor ketin rêza lîstokan û xwestin bi sêkevirk, nehberk û navbirkê bilîzin. Lê giyanê rojperstan ji bihna axeke tolêstîn e û hertim ji çavsor, kujer û talankeran re gotine: Pîp[1] û tît[2].

Ne dûr… Hîn delav û peravên çemê Arasê bi destaneya lehengên sedsala bîstê mijûl in… Ji vîn û pêdariya şervanên serdema mêrxweziyê seyr mane. Ma gelo Aras di xewa dîrokê de bû?! Na. Hîngê dîrok ji xwe seyr mabû, çavên xwe difirikandin û serê xwe li ber pêjna karwanê lehengan dadixist.

Xewna ku bi sedsalan di berîka dîrokê de dihate lelekirin û payîbûna wê tirs dixiste dilê tarîperestan îro pertewên rojê hişyar in û mirûzê demê berkenî ye.

Belê… Kordoxiyên ku dêrîniya pêdariyê ji memikên Zagros, Rost, Cûdî û Hawar mêtine, îro ji nû ve nexşeya hebûnê nîgar dikin. Bi sîngê demê girtine û dîrokê rast vediçengînin…

Dizên jiyanê yên xwînşîn di xwîna xwe de tên vegevizandin…

---

1 - Pîp: Dema ku zarok navbirkê (tehlûmbirê) dilîzin û dibe make yekî yên din jê re dibêin: Pîp.

2 - Tît: Gotineke watetinaz e. Dema ku mirovek ne bi qaserî gotinê be û li mirovekî gefan dide, yê din tinazan pê dike û jê re dibêje: Tît.

Mejiyên ramankufikî di gilîzê hovîtiya xwe de noq dibin

Bermayên enfalkaran mîna çeqelên gurî li çateriyên revê di warîniya dawiyê de ne.

Lêvên axa ku bi dilopên xwîna pakrewanan hatine avdan nûjiyan û vejîn e…

Zinarên ku sonda berxwedêran li ezber kirine, pêsîrên wan jiyanê dimêjînin

Çeperên ku çîroka lawên Kurdonîsê di hemêza xwe de mezin dikin ne xewn in.

Peravên deryaya Spî hîn hîrehîra hespên simkodînî yên Zikreşê Alalaxî ji bîr nekirine…

Hîn telbîsê deşta Sirûc, Raniya, Hemedan û Cûmê ji cirîda hespên Aştiyak ji bîr nekirine… Ma qey çîrok tolvedan e?! Belkî erê û belkî jî na be. Îro jînistana zarokên rojê ji rengên xwe tê xemilandin.

Nema navik bi destên xwînî tên birîn…

Sibeh ji giriyê reş vebûn…

Hêviya ji pertewên rojê tên hûnandin û sîmfoniya sirûda Ey Reqîb di guhên ezmên de diherike…

Vedizele… Miletê Kurd namire, namire û namire…

## Dilsoziya Lawên Rojê

Di mista şevê de giliyekî rengê dadweriyê û devê tivinga şervanekî xewnekirî bi lêvên xwe germ dike. Li ser navika girekî zikhişyar dîrokek dinalî û xwedêwendekê toza li ser deriyê perestgeheke rojperestan dadiweşand… Carina lêvên tivingan jî têne ramûsandin.

Di dêmên heyvê de gixikên şîrmijan mîna serxweşbûna sermemikên bûkeke kurmanc reng vedan… Stêrkan çav ji awiran mişt kiribûn û govenda şewqvedanê digerandin… Carina toza solên şervanan jî dibe kila çavan.

Di nav mijangên çerx û felekê de gelewêjê destaneyên sibehê bi wesekên pakrewanekê hene dikirin û bi tîrêjên royê goristana wê xelat dikirin… Berbang, ro û pakrewan sozdarên jînê ne…

Sozên xewnekirî ronahî ne… Ronahî azadî, aştî û welat e… Aştî û azadî hêvanê mirovatiyê ne… Welat ne tenê kevir, ax, gelî û çiya ne… Welat hezkirin û jiyan e…

Ne tenê soz… Ne tenê peyv, gotin û galegal… Hin soz mirovan li pey xwe dibezînin û hin mirov jî sozan li pey xwe diwestînin. Sozdar in… Lê carina dilsoz jî li siha pey xwe dinihêrin.

Bez riyan kin dike, lê carina jî gavan vedilikumîne û rê li hev dalîne… Ne rewrekfiroş in gavên vebrûsandî. Giyanpêdar in dilsozên sozdar…

Ji rengê dadweriyê… Ji dîmenên axeke têrxwîn… Ji vedenga lavêjên dayîkên dilşewitî û mîna awaza lorandinên welatekî têrlorandî vînwergir in sozdar…

Mîna salvegera pêxemberê evîneke vejandî… Mîna vebrûsandina nîşana bi sîngê jineke azad sozdar in dilsoz… Dildar in… Di nav lêvên axa welêt de kulîk, qurnefîl û tovên gênim diçînin...

Bi çîrokên êş û birînên te

Bi kelecana pêlvedanên hêrsa te

Bi dengvedana evsaneyên di paşela te de

Ayetên jiyaneke bihûştî

Ezê bi giyanê xwe peyda bikim welatooo!

Sînorên xwînrêtî… Têlên kulrêjî… Çeperên çavxwînî… Serdemên dernexwînî û riyên jehirkavilî ezê ji ser sîngê te rakim welatooo!

Ji sozên pakrewanekê.

Di nav perasiyên min de helbestek tê ristin… Li ser ekrana çavên min şanoyek tevdigere... Li ser zimanê min tîpên navekî çîk didin…

Nav yê te ye

Ekrana çavên min ji rengên te ye

Şano destaneya hebûna te û min e

Dildar û sozdarê te me

Bê te bê giyan im… Soz; ev giyan ji bo te ye welato!

Ji sozên pakrewanekî.

Vedenga dilê kezîzerên Kurmancan bangewaziya dîrokeke nîvrevandî dihûnin… Di nav destên lîstoka zarokên Ornîna de kelecana straneke ji giriyê darên xurmê berve beyabanan dikule… Ji hinan e ku vîna hezkiriyên rojê bûye siha kevirên ku di nav herifandina mizgefteke Osmanî de mane. Xwe ji bîr dibin ku sîlek li bin guhên duhiya nexweş ketiye û ax ji sozdarên Zagrosî re temenê lêdixe…

Rewandina bi zimanê mişkan bermayên şûrekî rizî û çogvedana li pêş bedenên sexte têwerî jêrzemîna nevegerê bûne… Konikê pilindiran ji tîrêjên royê re nabin bend.

Axîn, leylan, sezakirina asoyan û perspanê tariyê bûne kevirên li ser gora şahê pîrkabûskan… Şanogerên romanên kîndariya di nav xewnên çavsorî û derhênerên mirina xwe de riswa dibin.

Welatê ku bi zorê hatibû xaçkirin… Bajarên ku bêzariya jînê dicûtin… Gundên ku êş tif dikirin û navên ku ji bo reseniya xwe diqîriyan zarokên rojê hemêz kirine û sibeh bi meya berbangeke azad serxweş dibin… Sozdar û dildarên axê jî welat in…

Duha ku di nav gav û siha leşkerên tariyê de bi nepîrçekan dêmên demê diçirandin… Bi dilopên xwîna zarokên rojê bangên xwe bi reng dikirin û vedengek li pey xwe hîştibûn, niha ronahîperest dîsa perestgehên ronahiyê ava dikin.

Sozdar in lawên royê… Ronahîperest in torînên rastiyê… Pîroz e birayara dilsozên Kurdistanê. Hebûn û jiyan dilsozî ne…

Lê dayê..!

Lê dilovanê....!
Meke qêrîn  û menalîne
Rondikan mebarîne
Mebêje min bi qurbano rê dijwar in!
Bi dirî, belan û xar in
Mebêje min mere
Sûnda min pîroz e
Bi dêrîniya axa welêt
Bi wesêkên pakrewanên dozê
Bi gulên reng ji xwînê
Bi nêrînên te yên têrhêvî
Sûnd pîroz e; dayê..!
Ji riya xwe venagerim
Peymana min e...  Lê dilovanê...!
Eger bêne xar
Heyv, stêrk û ezman
Û li min bibarin
Kevirên sicîl û agirê dojehên derewperestan
Ji riya xwe venagerim... Venagerim lê perwerê!
Mebêje rê bi tirs e
Hene…
Dûpişk, retel û mar
Hêêêê… hê dayê…!

Xwîna min ji pêsîra te ye
Mora li pişta min
Şopa tepa bavê min e
Lawê rojê me
Li pişta hespê vînê
Berevanê jînê me
Li eniya pêşîn sînorê rûmetê me… Lê dayê!
Rondikan mebarîne
Ji ramana kûr im
Tolvedanê rojên dijwar û yê Newroza xemlexwîn im
Barhilgir im… Ji riya xwe venagerim.. Lê dilovanê!
Di hembêza gelî û newalan de
Li ber zinar û hîman
Pir xweş in şevbuhêrkên berxwedanê
Û çîrokên lehengiyê.. Lê dayê!
Çûna min hebûn e
Mirina min nûjiyan e
Lîlîyên te sirûd in
Li benda wan im... Lê mirovperwerê dayê!
Eger ne wek bê bim
zîndan e... jiyan
Birîna li ser sînoran
Êşeke bê ziman e... Lê perwerê!

Erk e… Soz e… Dilsozî ye
Ku berê xwe bidim rojê
Bazên li ser pişta bê
Nabin nêçîra çeqelên gurî
Li benda lîliyên te me
Jînvejîn in lîlîyên te lêlê dayê!
Şer li dar e
Banga welêt e
Rûmet e dîlana şanaziyê
Li benda lîliyên te mame... Lê dayê!
Lîlîlîlî…lîlîlîlî...lî….
Baweriya te li me pîroz be
Lîlîlîlî… lîlîlîlî..lî… Oxira te serkeftin be
Vegera te şahiya mezin be
Û Kurdistaneke azad be
Lîlîlîllîlî… Lîlîlîlîlî…. Lîlîllî…

**Efrîn: 01. 05. 2015.**

## Penabername

Di bêdengiya çûna xwe de em tên guhartin, bendavên qedexekirinê di hebûna me de binçavkirî ne û rûpelên demên me ji bîranînan dêşînin. Em bi welat in û biyaniyan em kirine penaber û hin jî bi zorê bûne koçber…!!! Penaberekî wisa digot.

Di mirûzê wan de birînine rengerengî dûr û nêzîk dipeyivin… Di kenê wan de hawarine veşartî pêl didin û birînên wan kûr dibin... Şevên wan çêrgeha pîrkabûsk û nalînine devekirî ne… Rojên wan çîrokine ji hevketî û bêdawî ne… Mirov in, lê kesek ji wan re nabêje mirov…!!! Li ser zimanê wan pirs li hev siwar dibin, lê bersiv di gewriyine teng de daqurtandî ne… Gelek tabloyan dibînin, lê bêtir xwînî ne… Carina jî ji xwe re dibêjin: Xwîn nîvjiyan e…!!!

Bermayên welatekî ku bi serdemeke tirş û tal hatiye berdêlkirin li çar aliyên gerdûnê bûne qêrîna çavên pêxemberê sezakirinê. Vêca dibêjin dad heye…!!!

Di şikeftên kendava cîhaneke tarî de pêriyine çavkesk devliserî dengê baran û şîrvekiriyên li ser sînoran dikin. Di riyên zincîrkirî de sîle li ser sîlê… Li

bajarên wijdanfirotî velikumandin li pey velikumandinê… Li kolanên birçîbûnê bîranînên li welêt dalêsin. Vêca dibêjin: Komeleyên mafê mirovan hene…!!!

Li penagehan nimre bûne nav û qedexe ne … Li dervî penagehan tên kirîn û firotin û bazar germ in… Yên mirî bê nav û carina jî belge tên şewitandin. Vêca hin jî bi navê wan keysebaziya xwe bilind û tûj dikin…!!!

Xanî hatin herifandin… Gund hatin hilweşandin û bajar hatin talankirin… Li wan penagehina serê wan û derûna wan ji çîrokên xwînî, destdirêjkirin û dizîna rûmetê avis in. Vêca şerma mezin hin li ser ekranên ku wek mejiyê wan sextet ne dibêjin: Em şoreşger û gelparêz in…!!!

Gewriya pêlên deryayê têr mirov daqurtandin… Qûma peravên deryayan ji çîrokên mirina zarokan bi qaserî serdemên dîrokê vePêrîiqîn… Masiyan nêçîra hevdu ji bîr dikirin… Nêçîrvanên masiyan neynûkên bi xidad û gustîlkên bûkaniyê ji zikê masiyan derdixistin û li paytextên avahîbiliiiind bilind firotin. Keysebazan jî di kerxanan de solên qehpikan bîn dikirin…!!!

Li paytext û di avahiyên camvebrûsandî de bazarkirina penageh û penaberan îmze dibûn û her aliyekî para xwe dixiste çenteyê reş… Bazara kirîn û firotina mirovan bi hemû şêweyan germ bû. Lê ji wan re nedigotin mirov, navê hemiyan penaber bû.

Penaber?! Erê... erê penaber. Li bazarên paytextan P: Li ba bazirganên mirovan pere ye.

**E**: Li cîhanê erzan erzan e.

**N**: Li ba wijdanreşan ne mirov in.

**A**: Li ser maseya dewletên biçûk û mezin Dolar in.

**B**: Di tomargehên komeleya mafên mirovan de bazar e..

**E**: Li welatên xwe bê nasname ne.

**R**: Mirina wan li riyan… Li ser sînoran… Di penagehan de… Ji tîbûn û birçîbûnê… Ji nexweşiyên curbecur rewa ye… PENABER in.

**12. 03. 2014.**

## Pêlvedana Ronîperestan

Kulîlkan çavên xwe vemrandin… Li ser lêvên dayîkan xunav miçiqî… Agirê êşa salan bi vedenga riyan ket û şevên dirêj bûn nêçîrvanên şahiya zarokan… Ma talana dîrokê jî derew e?! Belkî….

Pîrejinên ku torînên wan di keştiyên mirin û windabûnê de riwindayî bûn, gupgupa dilê wan dibû vedenga hawarine gewrîxetimî û nêrîn li pey asoyekî çavgirtî dibezîn. Li tenişt riyên têrxwîn çîrokên keser û derdan wateya mirovahiyê nîvcelqî dikirin. Ma hîn kayîka zordariyê dirêj e…?!

Ji serpêhatiyên êgir kolan pîr bûn û birîna çerxan nêma xwe di ser lêvên derewînan de diherikîne. Pût û peykerên parek ji bergeya gulistan, qad û dibistanan dagîr kirine. Ma hîn dereng e ku çîrokên pesnê bi dawî bibin?!

Milet têr hate dotin… Siruşt hate guratin… Welat tê firotin… Rengên tabloyan hatin dizîn… Xwîn tê rêtin û zimanşikestî pir in. Tekaniya yekrengî dijîtiya rengerengî dike… Ma hîn xew giran e û hişyarbûn derng e?! Na… na VÎNA milet netê dizîn.

Govdeyên pîroz ji şaxên baranê ne… Xeyalên mêrxwezan buharekê dimêjînin û sextekarên ku bi gilîzê teresiyê mezin bûne, mîna çeqelên ku ji warîniya xwe jî bi tirs in, tar li serê wan teng dibe.

Ji her tiştekî xwîn diherike… Kevir jî bi birînên xwe hestewar in… Ma PÊDARÎ ji nasnameya gel tê dizîn?! Belgeyên ku di sîngê çiyan de dijenin nasnameya pêdariya zarokên royê ne.

Mij… di birînên axê de xwe vedişêre… Perwînên tî di siha kavilên herfandî de bi kenê xwe êgir diçelmisînin û ji memikên roya pertewzêrîn vîn mêtine. Ji çîkdana vîn û pêdariya kezîzer û simbêlsoran ta ax û kevir jî bûne awirvedana azadiyê…

Xwîn… Rengê sor... Herikandineke zelqok… Dem ji birînan dinale… Pêlên deryaya Sipî bi xwînê têne şuştin… Qêrîn, hawar, nalîn û pirsên xwîndigrîn… Lê ji gewriya berbangê jidaykbûna rojê di sanciya xwe ya dawî de.

Ev ax… Ev welat…. Ev gel û siwarên bê di siha pûtan de kedî nabin. Karwan berve rojê rêketiye. Lawên royê… Şagirtên ronahiyê… Torînên Zagrosiyên vînçiyayî bûne dostên rastî, mirovatiyê, pêlvedana hebûn û dêrîniya xwe û cîhanê.

Sirûda vînê ronahîperestî ye… Sirûda jiyanê û azadiyê rojperest in. Stran in… Raperîn in… Deng û vedenga dîrokê ne… Şoreşger û şervan in… Dilsoz û mirovperwer in torînên Kawa û Tişarto…

**Şêrewa: 12. 09. 2015**

## Rastî

Ger di her dîwarekî tariyê de deriyek netê vekirin, hîngê ronakbîrî xewnerojk e. Hin xewnerojk dibin gotin û çand. Ku Kevir hate avêtin û li cihekî hişk an jî nerm ket, deng û vedengê dide. Ma çima gotin jî ne wisa ye? Vêca mejiyine sert û nerm jî deng û vedenga vê gotinê ne: ***Hezkirina jiyanê sedema her şaşbûnekê ye…!!!*** Kesê ji xwe hez neke, ma gelo dikare ji kesekî din hez bike?! Dikare doza mirovatiyê bike? Carina tê gotin: `` Filan kes xwehez e``. Lê nabêjin çima? Jiyanhez û xweheziya ji keysebaziyê parastî mirovatî bi xwe ye.

Em mirov û rastiyeke bêguman in… Vêca çima di ser sînorên wê rastiyê re gav dikin û ne wek xwe dibin? Bersiv ne mijdar û bi dûman e. Wekî tu heyî xwe bibîne… Bi çavên belewirî li hawîrdora xwe menihêre… Zimanê xwe fêrî tinazan meke… Hîngê xwehezkirin jiyan bi xwe ye. Vêca çawa wisa dibe? Zanîn, zanîn û zanîn.

Çi sergêjî û mejîtevzandin e loooo… Seyr e seyr dema ku tê gotin: ***Şahiya li dunyayê dînbûn e û bêzarî hişmendî ye!*** Ma gelo defik û bilûra xwediyên

vê gotinê ji bo girî û şînê ne?! Duniya û jiyan şahî ne… Mirov şahiyeke pîroz e… Mejiyên jiyanenas ne tenê bêzarîfiroş in… Jiyankujer in ew.

Hin dibêjin: ***Dawî mirin e. Ma jiyan çi ye***? Ev gotin mirin bi xwe ye. Hin kes dibêjin: ***Jiyana li dunyayê vala ye û pêkenokî ye. Jiyana rasteqîn û bêdawî piştî mirinê li dunyaya din e***. Çendî mirov seryr e looo…! Çavê rastiyê digre û yê xewneke nedîtî vedike…!!! Bi nebûna xwe mijûl e… Xwezî em bijîn û sozên mijgirtî ji sayîbûna xwediyê sozan re bihêlin. Jiyan xweş e looo… Xweş e jiyan looo!

Di hindurê me de dengekî tazî li xwe û me digere. Di guhên me de vedengeke vepekî bersiva pirsine raketî dipirse. Pênûs rast û ronahî ye, lê carina dîrok di ber giriyê pênûsê re têr hatiye badan.

Em li bersivan digerin û bersiv li me digerîn… Di rûpela dawî û hevoka berî dawiyê de tîpine ku ji zerbûna rûpelê bûbûn, besivek dan: ***Kurd bîrok in***. Çi pênûseke zimanşaş bû looo \`d\` kiriye \`b\`!!! Ma dîroka Kurdan ne şaristanî û jînvejîn e looo  Ferato…! Bibêje tu dîdevanê hebûnê yî Feratooo…!

Golvedana ji çîrokên Niyandirtalan e[1]… Di nav lêvên Lêlûnê dêrîn û Biradostê dilsoz de golvedana mirovatiyê ne. Ma ne rast e lêêê Duderiya dîdevan…!!! Bibêje hin li deşta Cûmê axê pêgeyê niyandirtalan ji dêmên xwe neşuştine… Hîn zinarên Şêrewa ji çîrokên we venebûne Niyandirtalinooo bibêjin!

Çendî di welatê xwe de jî bindest û penaber bibin… Baweşînên nerm, hênik û xelatên dilsoziyê ji sîngê me naweşin. Looo Sîpan û Xelato…!!! Ji sîngê xwe bersivan bibarînin.

Çendî bend û sînorên payîzî li ser govdeyê dayîka me çêkin… Çendî çavikên dîrokê bi şûjinên xwe kor bikin… Çendî agirê dojeha xwe di ser bihuşta me de birjînin… Çendî kîn û gilîzê hovîtiya xwe di xaka pîroz de biherikînin… Çendî kufika mejiyê xwe li ser şopewarên me daweşînin… Çendî bi pêgên xwe yên xwînî di nav daristanên zeytûnan re gavkin… Çendî, çendî û çendî… Zarokên royê pêlvedana ronahiyê dimînin, dimînin û dimînin. Looo Zagrosê bedenşaristanî ma ne rast e?!

---

[1] - Niyandirtal: Mirovên ku berî 100 hezar sal di şikefetên Kurdistanê de jiyane. Wek şikefta Duderiyê li herêma Efrînê û şikeftên Şanîdar û Zirzê li Bakûrê Kurdistan.

## Hawarên Evîndarekî

Ta kîngê şevê li ser balgiyê keserê raze û xewna kêleka min a çepê dê sêwî bimîne? Ta kîngê ezê nihrînan di bergeyên riyan de biçêrînim û ji memikên hêviyan giyan bimêjînim? Ta kîngê ezê lavêjan di guhên deman de biherikînim û şevan bi ziwabûnê nenî bikim?

Ez dizanim ku tu jî mîna Sînemê dildara Feqeyê Teyran di dilê şevan de hawaran diçînî… Li her berbangekê dibî hevala gelawêjê û bi lavijan bûkaniya sibehê pêşewaz dikî…

Ez dizanim ku helbestên te bi teşiya bangên dil têne ristin… Rojên te li pêjna helbestvanekî dîn dipên û hespê çavlirêmayînê riyên wî bajarî diwestîne… Lêv jî sar in… Dîlberê ez dizanim ku sibehên te bê tajan in… Li ser têlên tembûra bendewariyê mîna sazê Delêl li benda hatina te me, de were min bistirê, bistirê û bistirê.

Di fedîbûna asoyekî tazî de bawişka sibeheke bêzar im… Li ber bayê wê bêzariyê mîna baweşîneke kulek di xwe de dizêvirim… Dîlberê! Çavdêrê rê û gavên hatina te me.

Maseya li ser pişta rewrewkan xewna piyalan xistiye bin kurkê şevine çavçelmisî… Lêpayê riya me ku nêrînên min pêjna te bipelînin û heyv di dêmên te de bikene.

Qurnefîlên ku awirên stêrkan di pişt ewran de dinoşin, li dûr û nêzîkî wan im… Di pencereya dilê xwe re li hîrhîra hespê hatina te dipêm. Mîna serxweşekî bê mal di koşka bîranînan de xeyalên xwe bi solînên lêvên te aşt dikim… Gupgupên dilê xwe bi dîbekê demine nexewkirî lele dikim… Bangên dil di nav pêlên bêzariya şevan de li ser milên xewneke kesk sozekî avdidin…

Hebanê lavijan zirav dibe, ji jêrzemînê peyvan ferhenga coşê qaling dibe û li ser danişteka çavlirêmayînê rûniştineke kût hawar dike. Ma hîn qeşeya[1] bêdeng ji zerbûna gavan têr nebû?

Dizanim her ku hilama sibehê di nav lêvên penceraya camkenok re bê destûr derbasî hemêza mitêla te dibe, ji tajanên ramûsanan lêvên te berkenî dibin û wêneyên Duşem û Yeşeman di neynika giyanê te re bîranînan hene dikin.

[1] - Qeşa: Seqa.

Her ku zimanê zengilê mala min serxweş dibe, gupgupên dil dibin awazên zengilê şahiyê û mîna serxwşên ku di balkona şevê de hişyar in ji cihê xwe hildipekim, lê te nabînim dîlberê…!

Dizanim ku li pir şevan çîroka Yûsîf û Zuleyxa xew ji çavên te vedidize… Giriyê Xeca Mamê[1] seredana mijangên te dike û çavlirêmayîna Edûlê çavên te payî dike… Lê mîna siwarê erdê qulemişkan[2] dembirîn im ez.

Awazên mûzîkeke wek dengê te nazik karwanê hêviyên sibehan dilmest dikin û nêrînekê ji çavên te yên ku dem ji dînbûnê mişt kirine hêvî dike… Peyalên dînbûnê lêvên şev û rojan ji axîn û keseran westandin… Li benda şevbuhêrkeke bê sînor im ku bi tîna lêvên zirav û têrxunav heyv û stêrk jî ligel me sermest bibin dîlberê…

Şevbuhêrkên xewn û nîgaşan di hemêza şevê de dilolijin… Şev bi nepîrçekên sarbûna demê didize… Mîna pencereya dildaran payî me li tîrêjên tîna te dipêm… Lêpayînê bayê pêjna te ya tînvejîn im dilrevînê…!!!

---

[1] - Xeca Mamê: Dildara Siyabend e.
[2] - Siwarê erdê qulemişkan: Dewrêşê Ebdî.

Mîna strana bilbilekî ku birîna awiran û guleke xemgîn dikewîne, bêgunehiya sibehan di çavên xwe yên keservedayî de dimeyînim… Dixwezim tenê carekê bilbilên wan çavan ji berbanga dil re bistirên û di hemêza şevanan de serxweş û hişyar bimînin.

Dîlberê…! Helbestên şevê coşvejîn in… Bangên sibehê awazdîn in… Dîn im dilrevînê dînê bedewiya te me ez… Di gewriya nêrgizan de sozek li benda pelandina xunava sibeheke rêwî ye. Kîngê bi mezmûrên dildariyê perestgehên hevdîtinê dê serxweş bibin?

Di xewnên şevan de mîna kulîlkên gulyazê di zeviyên meraqan de geş dibî… Bîn didî û wek dînekî li xwe digerim… Dibim dînbûn… Barana dînbûnê û di demên xwe de dibarim, dibarim û dibarim… Di navika pênên berfane de dibim banga hişjêçûnê[1] û kela vedengan di ser min de dirjê, dirjê û dirjê... Kîngê mişkê demê wê bergeyên rê bikurisîne?

Roj û şevan bi hêviyan hene dikim… Ji xwe dipirsim: Kîngê ji mirqîniya ramûsan demê sergêjokî bibe û di bin dawa şevê de emê di hev de winda bibin, di çavên hev de li xwe bigerin, bigerin û bigerin.

---

[1] - Hişjêçûn: Dema ku hiş ji serê mirov diçe.

Kîngê bi xunava dildariyê solînên lêvan dê geş bibin û di navika ezmên de heyvê ligel me serxweş bibe? Kîngê pinpinîkên serxweşbûnê ji maçên tewşankî wê di çavên şevê de semaya dînbûna me bikin?

Ji xeyalê naziktir î… Di demên min de gulav î û herdem dibarî… Giyanê min xunaveke tî ye… Mîna pinpinîkeke demwestiyayî ku li Payîzê li geşbûna wan dêman dipêm, dipêm û dipêm… Tenê tu sîngêbuharî yî… Dilrevînê li Buharê digerim ez!

Ji gavên şevê dengek tê… Pêjnek meya qurnefîlan dinoşe û şûşekî devşil gewriya derfetê xelat dike. Mebêje ku goşiyên wî rezî nikarin peyala hawarên serxweş bikin. De were bila sazekî hêmin û hestine vêxistî şevê germ bikin.

Kîngê pinpinîkên lêvan dê buhara sîngê zozanî bipelînin? Keziyên ku semaya şevbuhêrkan ji bîr kirine û mîna melûlekî li bin baraneke cotmehî ku çep û rastê xwe ji bîr kirine, kîngê wê li ser sîngê min bi xewnên xwe re bilîzin?

Mijangên ku ji şuştina kilê westiyane û zimanê awiran ji bîr kirine, kîngê mezmûr û ayetên dildariya salan li rûpelên dêmên evîndarê xwe yê ku di siha birînekê de hawar dike dê daweşînin?

Kîngê emê bilbilên ku bîst û yek awaz di qefesa sîngê xwe de veşartine, wan li sibeheke bextewar azad bikin? Kîngê gulên nûbişkuvî dê serxweş bibin û bi nazdarî wê bihna min û te li xwe pîroz bikin?

Kîngê ji ramûsanên têrcoş[1] peyvê li ser zimanê rojê lal bibin û ronahiya heyvê wê ji nav ken û dêmên te hilê? Kîngê stêrkên ku şev ziwa dikirin xewê û riya hawarên hêviyan şaş diristin, dê lêborînê bixwezin û mîna guharên te di guhên şevê de vebirûsin?

Kîngê ji pişt sînorê mijangên te ezê çîrokên delxşikestî birevînim… Bi wan şewata rojên sêwî vemrînim û gemiya meraqên salan di nav pêlên hêviyan de bigerînim?

Kîngê emê zeviyên şevê û pertavên rojê bi barana maçan bişon… Werîsê bang û hawaran ji nava demê vekin û di ber semaya agirê maçan re şîngîniyan bi piyalan xînin?

Berbang bi bêhna te hişyar dibe û xewnên rewanê min di deryaya çavên hinguvî de melevaniya sozekî dilgerm dikin… Xwezî bergeyên riyan bişewitin û dûr nêzîk bibe…

---

[1] - Têrcoş: Ji coşê têr in. Ji coş têr û tijî ne.

Li her şevê bejna zirav di çavên heyvê de semayeke buharî dike û şevbuhêrka min mîna zarokeke sêwî melûûûl melûl in. Lêvên piyala demên min tî, kumişî û ziwa dinalin… Keriyê bîranînên gulane li kenarên şevê diçêrînim… Her ku kela dilê min bilind dibe bi nameya te ya dawî hêrsa xwe datînim…

Her ku agirê coşê terafa xwe di bedena rojan de gur dike, bihna xuha memikên te di gewriya wî de berdidim… Her ku şev tarî dibe çavên te li bîra xwe tînim.

Dilrevînê…! Buhara sîngê şeb û mermerî welatê hîngên lêvên serxweş e… Solavên porê têrgulav hêviya pelandina xewna tiliyên bê xew in.

**25. 10. 2014.**

## Elend û Baran

Mîna karwanên zarokitiyê dengê xwe di guhên elendê de rêkir… Vedengên nalîn û êşên dîlberê li ser lêvên sibehê mîna baxekî tî hawar dikirin û pinpinîkên dildariyê di nav agirê coşê de semayeke dîn diyarî ferişteyên hevdîtinê dikirin…

Xewnên dildariyê ji meya hestan serxweş û mest dibûn… Meraq di hemêza xewnan de li delxên xwe siwar dibûn… Dem dibû pêlvedana dildariyê û di navbera elend û berbangê de helbest dibû VEJÎN…

Jiyana vemirandî bi dildariyê dihate vêxistin… Erêêê… erê dildar im… Li min megerin… Di nav xewnên elendê de mîna meynoşekî ku sed piyal şikandine sermest im û hîn li piyalan digerim, digerim û digerim… Noşdarekî dînim.

Hîn bang bi dawî nebûne… Hîn nalîn diherikin… Hîn destpêka semayê ye… Hîn dem ji min maliq maye û pirs di stiwê heyvê de li ba dibin… Hîn dijenim û di paşela roj û şevan de bi tîna coşê dipiçpiçim… Dîn im… Dînok im… Ji çîkdana peyvên xunavî me û di

çavên dilrevînê de winda dibim. Xwezî xwe nebînim lê dînê!

Her ku xunav kulîlkan di dêmên sibehê de dikenîne… Her ku di çavên vî bajarî de du pêjin dibin yek… Her ku baran bi bihna nêrgizan tê şuştin, em di nameyên elendê de têne xwendin û bihna baranê dibe hêvanê meya lêvan… Noş… noş û noş…

Hîngê baran dibarî… Hîngê em di hev de dibarîn… Hîngê elenda payî evîn dibarand… Hîngê, hîngê û hîngê xweşikbûn, bedewî, nazdarî ji te dibarîn.

Çi li bîra xwe wînim? Ramûsan ferişteyî bûn… Ken perwînî bû… Awir Edolî bûn… Zend şêrînî bûn… Sîngkoçerî bû… Sermemik gulyazî bûn… Lêv pelgulî bûn… Dêm sipîfil bûn… Hîngê baran dibarî û em di hev de serxweş dibarîn…

Ezê kîjan sirûdê li bîra xwe wînim? Hîngê mirqemirqa maçan sazine bihuştî bûn… Axîn jî awazine nazik bûn… Vedenga her tiştekî simfoniyeke ji kêlîkên dildariyê bû… Hîngê baran dibarî û barîna dildariyê baran mîna giyanê me serxweş dikir…

Her ku baran dibare bihna porê hevrîşmî kela dil radike… Her ku ewrek dêmên ezmên radimûse û

rondikên şahiyê dibarîne, bîranînên roja evînbarînî li bîra min tên û dibim bîranîneke baranbarî…

Piştî roja evînbarînî şeveke stêrkşimitî helbestine şahîbarînî ji çavên me li ser maseya şevbuhêrkê tîpberbangî barîn. Dikenî, dikenî û dikenî çavên min jî wênegirên kenê têrdildarî bûn… Çivîkên dest û tiliyan sêvên xelatî dinikilandin û carina jî herdu gopikên rengulyazî dipelandin… Hîngê rîşiyên baranê porê sicê şeh dikirin û hevdeyên porê hevrîşmî sîngê min dipeçinî.

Eger xuleka xatirxwestinê dem dixiste dergûşa xemgîniyê, dil dibû rondika nerazîbûnê û li pey wê çûnê diherikî. Wekî ku tu hertim hebî, ez bi dilgeşî li kolanên vî bajarî digerim… Xwezî hertim baran bibare…

Xemçinîna meraqên dil î… Xanima li paytexta rojên baranî yî… Bi çûna te baran û baran nabarin. Di newalokên bêdengiya min de dem li xwe dalê… Di konê bêzariyê de giyan stranên sêwîtiyê ji hev diqetîne û dibim wek rêwiyekî rêdûr û pîrbûna demê derbasî çola bîranînan dikim.

Bêzariya şaxine verûçiqandî… Nêrînên şeveke tolêstînî û şevine demqurmiçî di keştiya xeyalê de li

baranê digerin. Erêêê… erê baran rawestî û şahî di gewriya dêwê bêzariyê de xewnekirî lorand.

Di nav rûpelên bîrveçûneke payîzî de nalîna tîpan xewnên jiyanê kom dikirin û di nav rondikên xewnekirî de nameyeke kenarşewitî li ber deriyê afrênerê evînê tê xwendin… Çerx û felek jî bi sindif e… Sîmfoniya bangewazên hawareke kelogirî di zeviyên demê de dibe birîneke bêdeng û derman baran e…

Her ku pêlên tariya şevê pîr dikin, xwedêwendê hêviyan li pêş deriyê şevê gilîzê kefecana xwe dalêse û li ser xaçeya qêrînan dem gêj dibe. Kî dibêje ku awazên baranê tên nişkekuştin?

Şev bihnqaling û xewgiran bû… Di bin miltanê wê de xewnan ji piyala xuhdana xulekên bezandî dem vedixwerin. Berî ku bawişka piyalên şevê hilê, li peravên nîgaşan xuh sardibû û bêzariya helbestan bi xew ve diçû.

Mûzîka helbestê dengekî biyan, gurmîneke veşartî û hêminiya lihevxistina baskên awazine tarî di guhên xwedêwendekî awarte de bê vedeng têve didan… Di wê şevê de ba ketibû xewa westandineke biskbirî… Şevbuhêrka nêrînan di gewriya şeveke kevnar de

çavdêriya hin dilopên baranê dikir… Şevê xew kir û dil di bîrveçûna xwe de hişyar ma…

Şeveke porkejalî çîrokek li yên şehrezadî zêde dikir… Şehreyarê hêviyan radestî bîranînên xwe dibû… Li wê şevê Fînos û Monalîziya çîrokên evîndaran li pesar û rebezên xewnekirî diweşandin… Di nav zendên wê şevê de kunê giyên ji bêjeyan vala dibû...

Di çavên wê şevê de birceke dirêêêj dirêj ji qurbaniyên çirûskan re ava dibû û demsaleke termşewitî sezakirina gundekî kevnar û çavsoriyeke ji sedsala bîstan li ser dişewitîn… Di wê şeva awirtûj de li ser tîbûna qûmê xewn û hêvî bêzar dihatin çêrandin û li baranê digerîm, digerîm û digerîm…

Di gerdenê wê şevê de pêjna fêlbazekê nênûkên bûkeke pêriyan xidad dikirin û li ser doşeka windabûnê gêjbûna zavekî heftêsalî bi serpêhatiyeke vemrandî dihûnand.

Li dawiya wê şevê kurepisteke zelal û hêmin deriyê hest û giyanê min dikuta… Şevê lêvên xwe gez kirin, dawa xwe li nava xwe gerand û hîn jî di ketina devegezan de ye… Sibeh tev bû baran… Baran barî, barî û barî, lê ez li vir û tu jî li wir î…

Rê li nava rê
Dûrbûneke kor
        Gulperîn î li wir tu
Nihrîn li bin kevanan
Çav tî û melûl
        Li vir girîbang im ez
Li ser navika vir û wir
Mirûztirş in roj û şev
        Qerezkar e dem ji bo me
Tîr diherikin sibeh û êvar
Rûbadayî ne çerx û felek
                Bêzar im ne li wir im ez
Her tişt zer û payîzî ye
Tim dibêjim gulbuharê
                Avdarî ne ez û tu
Likumandî û pirfirkî ne rê
Gav ji bergeya xeyalê
                Zû digihên hev… em

## Helbest û Melbest

Li Mîhrecanekê peyvine çelmisî û… ji ferhengeke qurmîçekî hatibûn şimitandin û li ser zimanê pordirêjekî sar û bê awaz velikumîn… Hey wax, wax û wax hinan digotin: Ev helbest e…!!!

Hevokine li hev alandî û… ji vir û wir parsekirî li ser zimanê zimandirêjekî nîvxewkirî ji xwe direvîn. Hey looo… hey lo hinan derew li xwe dikirin û digotin: Xweştirîn helbest e…!!!

Navnîşanine parsekirî û… di bin re wêneyine celiqî ji rengine civilî rêxistibûn û li ser zimanê mirûztirşekî li nav hev diketin… Şerma mezin hinan bejna xwe li pêş wî xar dikirin û digotin: Bijî helbestvanê gewre…!!!

Hesthincekî sê-çar hevokên watekurkurî ji ser zimanê xwe çep û rast avêtin û sê-çar caran axînî bi gewriya xwe xist… Çepikan dîwarên şanogehê vePêrîiqandin. Erê digotin: Çi xweş helbest bû looo…!!!

Kumekî qilênciyan li serê wî bû… Kab sist û navbadayî bû… Pelek ji beriya xwe derxist û piştê ku fişkînî bi pozê wî ket, çav di rûpelê de beq kirin û got:

Min heft şêweyên melevaniyê dizanîn

Lê ez çi bikim

Min di çavên te de

Ji bîr kirin

Ma çi bikim?!

Ji bo çepikên beşdarina wî bejna xwe xaaaar… xar kir û kumê wî di nav lingan de ma… Ji wî re jî digotin: Helbestvan e…!!! Ma gunehê tîp û peyvan çi ye?! Helbest ne gilokeke ji peyv û gotinan e…

Li wir helbestvan hebûn… Peyvbestvan, bêjerêzvan û melbestvan jî hebûn… Xwe ji bîr nakim ez jî li wir bûm…

Roja çepikan bû… Çepik, çepik û çepik… Hinan ji dengê peyvbestvan çepik germ dikirin… Hinan ji bejna bêjerêzvan re bejna xwe xar dikirin û çepik lêdidan… Hinan ji şivliva peyvbestvan re çepik û gotina ``bijî`` dikirin yek… Ji ber ku hin çepikhez bûn destên wan li dawîkirina xwendinê dipan…!!!

Tenê helbestvan bê çepik ji ser sîngê şano dadigerî û ji xwe dipirsî: Dengê min ne baş bû, yan bejna min ne lihevhatî bû? Belkî wî ji bîr kiribû ku ne her kesek

dizane guhdariya helbestê bike û asta helbestê bi çepikan bilind nabe.

Helbestvano….! Te çiqas şev kirine gurz û li ser maseya şevbuhêrkên xwe xistine guldana delx û meraqan…? Çiqas pinpinîk li hawîrdora mûmên hestan civandine û çiqas berbang bi pênûsa xwe hişyar kirine?

Helbestvanooo…!!! Çiqas peyv li ser lêvên te zindî bûne…? Çiqas kulîlk li ser maseya te ji helbestan serxweş bûne…? Çiqas car ferişteyan spasiya te kirine û helbestên te li ezber kirine…? Dilê çiqas evîndaran ji helbestên te sermest bûne…? Peyvên te yên nazik li ser lêvên çiqas dildaran çîk dane…?

Helbest zimanê dil e… Hêvanê giyan e… Helbest çîkdana vejîneke jibîrkirî ye… Helbestvan dostê Xwedê û pêxemberê hestan e…

## Çîrok

Afirandina erd, ezmên û giyaneweran çîrok e… Hezar şev û şeveke Şeherzadê ligel Şehreyar gurzek çîrok in… Jiyana mirov jî çîrokine watedar in… Her rojek çîrokek e û çîrokên ro, heyv û stêrkan jî hene.

Di navbera erd û ezmên de bi qaserî stêrkan çîrok hene… Awirên stêrkan li ba evîndaran çîrok in… Roj û şevên dildaran serûber çîrok in… Bişkovkên miltan û fîstanê evîndaran ji çîrokên evîndariyê ne. Parek ji jiyanê çîrok e. Pirtûkên pîroz ji çîrokan mişt in… Her mirovekî bêtirî çîrokeke wî heye, hin diyar û hin jî veşartî ne. Çîrokên berf û baranê jî bi siruştê re hene… Pêlên deryayê çiqas çîrok ji peravan daqurtandine û dîrok bêzar kirine, tenê çiyayên bilin û zikê deryayê dizanin. Çîrok dirêj e…

Hin çîrok mîna keçên porşehkirî, çavkildayî, xemilebûkanî û lihevhatî ne… Hin çîrok mîna parsekên porhinc, cilperspankirî û bîntirş in… Ma gelo dibe ku çîrok mîna nîskê bê serî, pişt û zik be?!

Çîrok bûyer, dem, cih û ziman e.

Ne stran li ser lêvan bû… Ne bilûr di nav tiliyan de bû… Ne jî peyvbestekê xwe di koka zimên de veşartibû. Di nexşeya dêmê wê de romaneke ji vîn û pêdariyê demine westiyayî hatibû hûnandin… **Pîrejineke Kurmanc bû**

Bi darikekî şirtê berîka axê vedijot, bi keserine kûr xelekên zincîra bîranînan bi hev dixistin û jêmayê giriyê xwe diyarî tamarên dara zêtûnê dikir… **Dar li çiyayê Kurmênc bû.**

Hêminî û bayekî fincfincî carina pirsar û carina jî germ dibûn. Nêrînên ku teze ji şorbûna fêrmiskan rizgar bûbûn, pêjna karwanên pakrewan û koçberan dipelandin û qeflek hêvî berve riyên vegerê rêdikirin… **Diya koçber û pakrewanekî bû**.

Tiliyên wê yên ku têr teneyên zeytûnê ramûsandibûn, xewnên berhefkirina temen heftêsalî ax pîroz dikirin. Di dêmên wê de nexşeya welatekî berxwedêr sibeheke dêmkenok hemêz kiribû. **Çiyayê Lêlûn bûkaniya deşta Cûmê hemêz kiribû**.

Di sîngê wê de serhildanine ji wesêkên axê û ji rengê gênim çîk didan… Gupgupên dil ji hêrsa penaberan, zîrkezîrka dergûşan û hawara gundên Şengalê pêl didan.

Pêdariya darmaziyê… Jidayîkbûna berbangê… Dêrîniyeke bê navnîşan… Kobûna şûrekî destikzêrîn … Tûjbûna xencereke zîvî û hilma xwîna pakrewanê Robuskî di buxçika dilê wê de ahengeke avis dikirin. **Navê pîrejinê Dilkurmanc bû**.

Di nav qirme û çirtikên fîstanê Dilkurmancê yê kurmanckî de çîrokine watevêxistî li xwe digerîn.

Di bereniya wê de serpêhateyên şevine seqayî û xewnên nalînine dorpêçkirî dem dikeyandin.

Di nihrînên Dilkurmancê de sînemayeke nivşewitî, alafa agirekî birçî û hawarên jinebiyekê dîlana şer û aştiyê digerandin. **Bi hêdî şoreşekê çîk dida**.

**20. 08. 2012.**

## Pênûs

Gengeşeyeke germ û carina jî bêdengî ye. Ma gelo dîn im?! Yan nikarim xwe ji dînbûna hiş rizgar bikim? Belkî herdu bin û belkî jî tiştine din bin.

Mîna pir dînên berhemdar dixwezim radestî tenahiyê bibim û damarên tîp, bêje û wateyan fireh bibin… Tîp û pênûs xwedêwendên dînbûneke serberdayî ne.

Meraqdar im ku bi wateyine çîkdayî demê seza bikim û wateyên revok zindî bikim. Tîp, bêje û wate jî dêşin, dinalin û digirîn û gunehê wan di stiwê pênûsê de ye.

Pênûsên revok bi tinazên wateyan riswa dibin… Li dawiyê tolvedaneke çavsor wê dişkîne. Pênûsên zimankor nizanin çavên wateyan kildin û wateyên çavnekildayî ji berê tîpine çavtirsî ne. Pênûs bi xwe şoreş e.

Kelayên zorê, kursiyên zordaran û ta mirin jî ji pênûsê bi tirs in. Lê ne ji her pênûsekê. Looo şervaninoooo pênûs… Bawerî… Vîn… Di pişt re tiving e looo…!

Carina tê xwestin ku mirov nêzîkî banga kulekên jînê bibe û hin şaşîtiyan têxe tûrikên mejiyê xwe… Carina tîpeke şaş ne tenê wateyê, lêbelê pênûsê jî seza dike. Pênûs pîroz e… Lê ne her pênûsek. Xwezî pênûs ne dîlê xewnine dûmangirtî bin. Pênûs hêz e…

## Darbest Ne Welat in

Dest û hêviyên xwe li ser deriyine girtî ji bîr dikirin… Gavan ji dirêjiya riyine pirxewn tevna rêdûriyê girêdan û hîn diçe, li hawîrdora xwe dizêvire, digere, digere û digere...

Rê mîna demine ji valahiyê avis… Çûyîneke mîna jineke ducanî… Armanc carina nêzîk û carina jî di pêş de dibezîn û tenê wek rewrewkeke tîrmehê bergeyên rê bi xwe re dibezandin…

Li ser dîwarên li tenişt rê wêneyê mirovine dêmpêçayî… Bêjeyine ji xwe xeyidî û bihina axeke tirş dem li ser balgiyê riyine temirî tew dikirin.

Zinar bi siha xwe re dipeyvîn… Li tenişt rê zarokekî ku lingekî wî li nîvê rê hatibû dizîn û di nav komek mirovên zindemirî de stiraneke zindî diyarî agirekî nevêxistî û çemekî awaztazî dikir û digot:

Li vê xaknîgariyê jiyan nişkekuştî ye

Rê, sînor û kolan xwînvexwer in

Şahî, seyran û ken qedexe ne

Gotin, helbest û hêvî sindifkirî ne

Çav û guhên ezmên…

Ji dûmana reş û sipî xetimî ne

Bihna henê û tîna gustîlkan hatine jibîrkirin…

Pênûs, lênûs û lîstokên zarokan… Dar, landik û gulistan tên şewitandin û ji bihna kizirî gelî û newal gêj in... Roj û şev bûne darbest û goristan têr nabin… Vêca dibêjin: Ev welat e…!!!

**09. 02. 2010.**

## Pirsine Xemgîn

Çima danişţekên gulistanan wek zarokên sêwî bê şahî ne û tenê şopa pepilên hin çûkên ku baskên xwe ji bermayên xunava şeveke bêdeng vepijikandine li ser dêmên wan in? Bersiv li ba kê ye lê dayê?!

Çima sibeh, kolan û paşela bajarê me wek bêzariya gundekî Kurmancên Dêrsimê û şonwarekî koçeran roj û şevên xwe pêçane? Ji bo çi êvarên vî welatî wek gewriya kalemêrekî Qereçî dike xîzexîz û deng jê nayê lê dayê?!

Bibêje; çima li dawiya her şevekê heyv bi stuxarî xatirê xwe ji hembêza gund, bajar û bajarokên me dixweze? Ma qey awirên heyvê şevbuhêrkên qurnefîl û evîndaran ji bîr kirine?! Li bersivê digerim lêêê dayê!

Çima bersivên te jî wek ên pîrejineke Ezdahî ku hîn dengê fermana heftê û dudiyan li ser zimanê xoçeyekî teres di guhên wê de dadirive, newêrin guhên min germ bikin? Ma qey bêzariyê ferhenga zimên li ser zimanê te şewitandiye lê dilovanê?!

Çima lêvên pencere û deriyên vî bajarî hûr hatine dirûtin û berbang bi sîmfoniya giriyê şîrmijan hişyar

dibe? Çima stranên Karabêtê Xaço û Cemîl Horo netêne bihîstin? Ma qey stiranan jî di berîkên koçberan de sînor derbas kirine lêêê perwerê?!

Ka bibêje: Çima keriyê bersivan li ser zimanê te di mexeleke pîr de ye? Çima di nêrînên te yên têrpirs de bêdengiyek digrî û li ser lêvên te yên ku ji zû ve tajanên evîndariyê nexurandine, helbestine ji keser û kovanine bêdeng têne ristin? De ka bibêje lêêê dayê!

Ma qey dengê te di berîka bavê min ê ku pir sînor dane pişt xwe de hatiye jibîrkirin..?! Ma qey bavê min kilîta bersivan di berpişta xwe de veşart û pişta xwe da me û vî bajarî û dûûûûr... dûr çû?!

Kenê sibehê û maçên te wek baraneke xunavî ya Avdara Çiyayê Kurmênc bûn û şahî di dêmên min ên biçûk de dikenand. Çima reşikên çavên min nema dilîskînin…? Çima fêrmiskên te yên mîna dilopên baranê yên di nav pelên kulîlka yasemînê de şêtûmêt in? Ji min re bibêje lêêê dayê, perwer û dilovanê!

Aaaax… ax keça min…!

Roj bi roj hêvî têne kurisandin… Meraqên di şûşeyê dilê min de kesk pêl didan û bi rengê kulîlkên zerzerka li qeracekî tî tên guhartin. Kolanên bajarê me pîr

radizin û çelmisî hişyar dibin. Ax û sed carî ax lêêê keça min!

Koçbûn, koçkirin û koçberiyê bi xwe re hêvî, meraq û şahî koç kirine… Bi koçberiyeke hêvîwindayî hebûna xwe winda dikin… Stranên windabûna me dubare dibin û çavreşên ku xewnên dil bi hêviyên gulane dimêjandin, îro kovan û keseran dihûnin û bi bilûra êşan pirsine xemgîn dilorînin, dilorînin û dilorînin.

Lê hêvîgirînoka diya xwe…!

**14. 07 2015.**

**Çima keziyên te bêzar in?**

**Ji ber ku tiliyên te koçber in dîno.**

# Ji Bo Çi Pirs?

Ne kendaveke malîzî me ku keştevan qeyîqên xwe li hawîrdora min bikin zincîr û piyalên meyê bavêjin nav pêlên min.

Ne dareke bilind û tenê ji bo xewa balindeyên biçûk û mezin im… Ne bergeyek ji mijê me ku li çateriyan karwanê rêdûran bajom gewriya riyên şaş.

Li sînorên ronahiyê dildar im, bêzariya şevên sêwî dişewitînim û perçeyên kenekî windayî berhef dikim. Di rûberê şahiyê de bergeyek ji giriyê wê xewnê re me ez. Belkî xewneke kin û belkî jî dirêj be, lê ji çavên ku têne dotin re serpêhatiyeke kin û dirêj e. Ji bo çi pirs?

Dizanim ku kurtejiyana evîndaran bê girî xav e, lê çavên hinguvê ne yên fêrmiskan in. Nihrînên wan çavan fêrî semaya evîndariyê bûne. Dilistanê…! Semager im û hertim di navkela dînbûn û dildariya te de mest im.

Stêrkên ku çavdêriya şevbuhêrka me dikirin û wêneyê ramûsanên siha me werdigirtin, xwezî nameya me radestî heyvê bikin… Belkî bergeyê girî bibe dilşadî lê çavhinguvê…!

Şahiyeke mezin bû… Tenê sorekî vekirî ekrana çavên min direvand. Dengine pir û mûzîkeke nazik hebûn… Tenê awazên ku li ser zimanê te diherikîn li têlên tembûra giyanê min tomar dibûn. Pir qeflên nêrînan berve min dihatin rêkirin… Tenê tîrkevanên awirên ji çavên hinguvî nêçîra dil dikirin. Ji bo çi pirs?

Evîndarekî dîn im… Helbestvanekî dînok im… Dînekî windayî û tenê di çavên te de xwe dibînim… Ma ne te nav li min kir dînoooo...?! Vêca çima pirs dildarê?! Çavhinguva dildînokî tu lê canistanê…!

**18. 12. 2014.**

## Barînine Evînî

Her gulekê awirên xwe yên xunavî bi aliyekî de rêkiribûn û semayeke buharî diyarî bilbilên berbangeke dêmkenok dikirin… Hîngê min helbestek ji ji evînê dihûnand. Di nav raperînên xeyalê de agirê dil bi bîranînên gulane vedimirî.

Şevê konê xwe vedigirt û konekî sar bû… Likelika lêvên ezmên ji rengê guharên te yên zîvî zemelîk hol dikirin û di hemêza odeya sîngrût û dawvemalandî de berfa zozanên sîngê te xewnên giyanê min germ dikirin. Heyv, stêrk û dem bê tîna lêvên me sar in dilrevînê!

Di nav şerê bê û baranê de şikêra bîranînên qeflok û şermokiya derfetê dibûn taldeyê rêwîtiya xewneke nûpayî û di henaseya ewrên bîrveçûyî de qebeqebên dil dibûn awazeke nîvçemayî.

Çendî govdeyê demê bi hêrsa firteneyên zivistanî. bi gurgîniya ewrên bahozan û bi dûrbûneke kor were şuştin, bîna xuhdana mêkewên sîngê te telbîsê rewanê min e lê dilistanê...!

Sond bi keservedana dilê Şêrînan… Bi çîvanokên qêrînan û hawarên dil… Bi birîna Siyabendê dildar û pîroziya duşemên nêrgizî ji dînbûna dildariya te venabin, venabin û venabim… Lêêê giyanistanê…!

***

Derengiya şevê ye û keziyên te sozekî tenêmayî ne. De ka bila xunava lêvan giyan serxweş bike. Bila soz bibe boneya roja ramûsanan.

Eger dûrî min bî, kovîdem û dilbejî me ez… Lêêê prîdêmê…! Te fêrî straneke barandî kirime… Te hînî sibehên ku bi pêjna te hatine xurandin kirime û di perestgeha hembêzkirinê de dîn perwerde kirime… Lêêê dêmbixalê…!

Bi kû de biçim û çendî dûûûûr... dûr biçim, ji rengê evîna te vedigerim. Li kû winda dibim tenê di çavên te de xwe dibînim… Lêêê lêvhinguvînê…!

Min xwest xwe fêrî dûrbûna te bikim û bi bermayên wan maçên li sibehan demên xwe nenî bikim. Te nav li min kiribû Dîno. Ji ber wê jî çi dûr û çi jî nêzîkî te bim, tenê bi te re dîîîîn dîn dibim… Lêêê maçdînokê…!

Mîna guleke ku pinpinîk û hingan seredana kenê wê nekiribin, geş in dêmên te dîlberê… Mîna zarokekî lêvbirçî li şîlava gupikên sêvan digerin… Lêêê dêmgulê…!

Mîna bilbilekî berbanghez awazên bangewaziyeke bêdeng li ser zimanê min diherikin… Kîngê xunceyê ji xunava lêvan bibişkuvin û berbangê ji helbestên têrevîn mîna dilê me serxweş bibin? Lêêê dêmberbangê…!

Berî ku dibim dilopeke zer û bê reng dimiçiqim, bila carekê rengê çavên hinguvî di çemê dildariyê de min noq bikin û em bi hev re di hev de bibarin, bibarin û bibarin lêêê evînbarînê…!

***

Di navbera giriyê tîpan û banga helbestê de pêwendiyeke seyr sertiya wateyan bi fêrmiskên dil nerm dike… Helbestvanekî dilmest im… Dildarekî evînperest im… Evînperestekî evînoş im… Carina digrîm ji bo helbestên evîndariyê bihûnim û carina wan dixwînim ji bo negrîm. Evîndar jî pir digrîn… Lêêê peyvşekirê…!

Çavên te deryayên helbestê ne û helbestên min ji giyanekî tî ne. Şev û roj bi rondikên coşê tên şuştin û agirê dûrbûnê perperîkên şahiyê dişewitîne.

Şivanê agirê hestan im û carina dişewit im… Carina dibim zeviyekî kesk û keriyên bîranînan lê diçêrin… Şivanê agirê hestan bêdem im… Siwarê hespê xeyaline dîn im… Dostê peyvê û ristevanê tîp, bêje û hevokên zîz im. Kîngê emê çavên sibehan ji evînê kil din û mîna gul û bihna di hev de winda bibin lêêê biriwkevanê…?!

***

Carina berbangê di hemêza dîlberê de dikim xewê… Di nav mijangên wê de sibeh dibin şahiyeke vêketî û carina jî hêvî dibin balgiyê şevên ziwa…

Carina dibim şivanê xeyalên xalxalok û perwaneyên koçber… Awazên bangan dibin nalîneke keçîn… Dem dibe sazên çemekî xemgîn û hest dibin sîmfoniya giriyê zarokên dersînor. Li porsolavê digerim, digerim û digerim.

Xwedêwenda evîn û hestan î… Wek hilma kaniyên Kurdistanê pevnazik û nerm î… Mîna xewnên bûkanî nazdar î… Lêêê gavahoyê tu singfil û bejinzirav î…!

Mîna hingeke bîstrojî dil hişyar e û li werzên te yên kulîlkdadî digere. Çima werzên te yên buharî bendkirî ne lêêê meraqistanê…?!

Di paşela vê sibehê de nêrîn bê çêrgeh in… Meraqên lêvan bê tebat in… Li xwe digerin… Li werzine nêrgizî digerin… Dilrevînê…! Te dil revand û lêgerînê dil im û tu dilistan î.

***

Li sibeheke Çarşemê bibe mîvana tenahiya min a ku ji êşa rêmayînê bûye tizbiya kovanan… Çarşem pîroz e. Qewalê evîna te me… Lêêê dîlberê!

Li Çarşema Nîsanê zevîyên meraqa dil bixemlîne, bila tenahî ji mirûztirşbûna xwe vebe û qewlê sibehê me di hev de payî bike… Lêêê dîlberê…!

Li şeveke Zivistanê bibe wêrek… Mîna Dedeyekî Dêrsîmî ezê tembûra şevê bi beytên evîndariyê serxewş bikim…

Li berbangeke Yekşemê hewzikên riya mala min ji xewa giran hişyar bike… Ezê demê bikim perestgeheke xiristiyanî… Bibim nasikekî dunyaberdayî û tenê nimêjên evînê bikim.

Deriyê Şemiya girînok bikute… Ezê bibim haxamê evîndariyê û hemû mezmûrên dildariyê di ser rûpelên bedewiya te de bixwînim… Şemî pîroz in… Bi evîndariyê pîroztir in dibin lêêê dilrevînê…!

Bi tîna awirên xwe govdeyê Sêşemê germ bike… Ezê sê salên çavlirêmayînê bikim salvegera sewdayê û wek kalemêrekî Zaredeştî ji tavikên te re nimêjê bikim.

Çavên Pêncşemê ji rondikan bişo… Bila wek qurbetekî serxweş û di konê çelengiya te de têr veweşwişim. Bextewar im ku ez û rojên hefteyê bi hêvanê eşqa te bimeyin… Pîroz in heft û roj… Duşemhez im… Dilrevînê meraqçarşemî ne ez û tu.

***

Salê bixçika xwe ya tijî êş, kovan û belkî şahiyine bê reng jî di wê de hebûn, avête ser milê xwe yê ku ji loman qop bûbû… Xatirekî zer xwest û di riya nevegerê de çû, çû û çû. Dilrevînê tenê tu mîna bejneke xewnekirî di bejna bê de dikenî, dikenî û dikenî.

Salê dawa xwe pêça û di aliyê min ê çepê de birîneke bêdeng dihûnand û koçkirineke girînok di hemêza demê de mezin dibû. Bendewarî bû tîbûneke pîr û siha xewna min digrî.

Şevên bidûrxistî kirime mîna aveke ku ji tîbûnê dinale. Kîngê deriyê şevê wê bibe şahîvejîn û emê di tazîbûna dildariyeke tazî de bê, heyv û gelawêjê bi xwe re sermest bikin… Lêêê memiksêvê!

Bêdengî siha mirinê ye û ez li cihekî bê dem im. Min bang westandin û hindik maye ku bibim penaberekî jibîrkirî. Ma hîn dûr e ku em di çavên hev de hişyar bibin?!

Ramûsanên heyvê di nav perspanên ewran re xwe vedidizîn û bejna çiyayê Lêlûn bi ronahiyê deq dikirin…. Awirên stêrkan mîna yên keçên dilmest rast û çep dilîzin û şaxên daran mîna semaya bûkeke fedok dilivin… Li dînbûna xwe digerim, digerim û digerim. Lê çi bikim berge mirûztirş in lêêê mirûzşêrînê…!

Kûrkûrkên şevê bi awazan li hev digerin, dibe jî ku xewnên xwe ji hev re hewal didin, belkî jî sozina didin hev. Dîlberê…! Vedenga sazên wan pir xeyalan zandin didin û ez li xwe digerim.

Di landika coşê de dilolijim… Dara gozê gupgupên dilê min dijmêrin… Mijeke sêrek û bezok ji pelên daran re guharokan çêdikin û pêlvedana bayê hêmin ji bihna kulîlkên yasmînê bîranîn serxweş dikin. li serxweşiya te û xwe digerim, digerim û digerim lêêê xewxweşê…!

Refê xeyalên dûûûr… dûr firî difirin… Belkî di nav lêvên rodankeke xemgîn de bîrve biçin… Belkî bibin hevalên dilpayîbûneke dildar… Belkî katjimêra rojan bi paş de bizêvire… Belkî keser û hêviyên evîndariyê di zeviyên demê de biçînin… Belkî, belkî û belkî lêêê perperîka dûrmayî..!

Xunava ku di çavên şaxekî dara gozê de bûbû mîna rondika dilşadeke bextewar, dilopek di ser rûpela ku tiliyên min germ kiribû de dadirive û di çavên tîpan de dipijiqe… Refê xeyalan li ser zimanê pênûsa min venîşt û ji bihna giriyê dûrbûnê delxek rijîn:

Dîlberê…! Ezê tevahiya xwe û para xweşik ji vê şevê têxim buxçika bayê Gulanê. Belkî lavijên berbangê giriyê giyanê me hêsayî bikin…

Lêêê cavbikilê…

Dêmkenokê…

Dilrevînê û sîngbixalê…

Evînzê û dilistanê…

Enîgelawêj û memiksêvê

Ji te hez dikim ez.

***

Sûlavine henekirî ji mijangên ewran şilokî dibûn… Çavên hinguvî bi rîşiyên baranê hêviyên nihrînan hene dikirin û ronahiyekê di kêleka wê ya çepê de êşa nalîna sibehan dimêjand.

Kayîka birînan û çîkçîka tîpan berbang tewanbar dikirin… Dem mîna ewrekî şewitandî di landika xeyalan de disotî û tîbûna fêrmiskan li perava deryayên meraqan dibû lêmişta bang û hawaran.

Carcarina dûrbûn nîşana hebûneke payî ye… Bêdengî û tîbûna şilêran vedenga bangine zîndankirî ne… Carina evîndar giriyê helbesteke dîn in… Bayê baskên pinpinîkine agirhez in û carina jî xunava li ser pencereyên zaroktiya jiyanê ne.

Kesrên evîndaran ne ji wateyine jibîrkirî û windayî ne… Nalînên wan helbestine ku hîn nehatine nivîsandin in. Bi kulîlkên hertim dil mijûl in evîndar… Ku ji hev dûr bin coşê dimêjînin… Ji bendewarî û

çavlirêmayînê holikine ji bîranînên dildariyê re ava dikin…

Tenê evîndar dizanin xewnên keviran bixwînin… Kizotên coşê di hemêza xwe de hilgirin… Dibin dostê kulîlkên di nav bahozan de. Tenê evîndar dizanin helbestên ku ji vedenga dilên tî hatine hûnandin bixwînin… Evîndar pêxemberên jiyanê ne… Evîndar…

# Xwedêwendên Hestan

Koçberî pişt sînorên xeyalan dibin… Di berge û rûberên mijê de bîreyan dikenînin, vedibrûsînin û bangan dimêjînin. Xwedêwendên hestan...

Zimanê demsalên demê û jiyanê ne… Ji pelên payîzê agirên kesk û hênik dikin baran û şewata dilan vedimre… Şarezayê zimanê gul û bilbilan. Şahîvejîn in xwedêwendên hestan. Kovan û keseran bi peyvên bihîstî û zîldayî didin revandin. Jiyanbarîn in xwedêwendên hestan.

Ji bîna qurnefîl, nêrgiz û solînên nûbişkuvî dihûnin naziktirîn helbestan… Ji ewrên xeyalê vedidizînin xunavtirîn peyvan. li zeviyên meraqan dibarînin û hestên payîzî dibin buharhest.

Şaşîtiyên bê û penagehên bêdengiyê... Peyalên tenahiyê û demên hîzalzer…Bi barîna peyvên xunavî dikin buhareke bihuştî û demên ku di hemêza bêzariyê de gêj raketine payî û geş dikin. Nimêj, nimêj û nimêj ji bo xwedêwendên hestan…

**28. 12. 2010.**

## Nameyek

Na... na; ne rondik in… Stranine zelal û germ in… Barana bîrêkirinê û bermayên kesera xwetirxwestinê ne.

Na… na; ne dilopên bêzariyê ne… Nameyên hevdîtineke ne diyar in. Di kêleka te ya çepê de bûk û zaveyek dilşad in.

Dibe ku di nalîna tîpine birîndar de… Di pêçeka gunehê siheke revok û rengwindayî de, yan jî di keştiya bê de em hemêza demê germ bikin. Em destaneyeke serxweş in.

Ne Zivistan e… Tenê hin roj bi berfê re dibarin… Çîrokên hing û pinpinîkan… Meraqên rengê evînê û sîmfoniya demsaline şêtûmêt in… Ji kulîlkên bê û rojê re bîranîneke zembîlfiroşî ne em.

Na… na; ne fêrmisk in… Vedenga kurtepistên banga dil in… Ji hilma lavijên evîneke pîroz û kelrijandina hestên xunavxwez in. Belê lêêê dilrevînê…! Kolanên wî bajarî perîşan û dilsar tên keyandin. Rê ne konikgirtî ne.

Li berbangên vê Avrêlê keçîniya helbestê û tîna straneke botanî yî tu.

Xewna gulên meraqkeçîn î… Di navbera çîkdana navê me de çardeh pertewên bextewar in. Ne çavlirêmayînê vegera xwe me. Em di giyanê hev de penaber in?

**10.06. 2015.**

## Ez û Helbestê

Kenê sibeheke Cotmehê şahiyek di dêmên dayîka min de herikand… Mirûzê bavê min ê ku giyanê wî ji hilma axa gundekî çiyayî têr bûbû berkenî bû… Hîngê gelawêjê awirên xwe diyarî xwedêwenda berbangê dikirin… Hîngê heyv û stêrk li çateriyên riya kadizê dîlaneke kurmancî digerandin.

Dengekî girînok ji gewriya min azad bû, li têlên perdeya guhên bapîrê min bû awaza vejîna jiyaneke nû… Dêpîra min a kezîhenekirî lîliyeke nehmehî ji berîka zimanê xwe rizgar kir û nav li min kir Merwan…

Salan buharên min bost kirin… Hêdî hêdî xewn di giyanê min de payî bûn û hest di govdeyê asoyên ciwan de bûn rêwiyên vejînine çîkdayî…

Bi zîldana buhara bîst û nehan re pênûsa zimantazî delxek ji buxçika hestan revand û li ser dêmên rûpeleke keçîn hûnand…. Nîvê kenê heyvê ji siha gozemînê hate vedizîn… Delxekê di quzîkeke

XUNAVÊ[1] de rengveda. Ji hîngê ve ez û meraqa helbestê wek ewr û baranê… Hilm û axê di paşela hev de dikenin.

Dêmbixalê…!
Gelawêjeke kenvebrûsandî yî tu
Nazik û dengawaz î
Li şevbuhêrkên dil
Di hev de winda dibin ez û tu
Evînbarîn î lêêê dêmbixalê!
Ey perî û dilrevînê!
Di kişwera dil û giyan de
Diltiyê evîna te me
Were yan werim
Yan jî bi banga sibehê re
Çîroka Siyabend im.

Her ku hest çîk didin, li gor rengê wê çîkdanê wêneyên helbestî vedibrûsin. Carina ken û girî di hev de renvedidin… Carina ji memikên çiyan xewnan didizim… Carina bi zimanê birînê şevan nenî dikim û bi simfoniya gixikên şîrmijan sibehên qeflî hişyar dikim. Di

[1] - XUNAV: Kovareke bi zimanê kurdî di dawiya salên heyştiyê û salên nodî de ji sedsala bîstê li Rojavayê Kurdistanê dihat weşandin. Li sala 1992an ez endamê desteya sernivîser a vê kovarê. Helbesta min a yekê li salal 1989an di kovara Xunavê de hate weşandin.

bin lîlavên berfê de helbest ji meraqên demine evîndar dibare…

Ji ber ku...
Stêrkan kenê xwe
Ji dêmê te revandibûn
Wê ûştê...
Golvedana şahiyê ye
Heyva şevê
Ji ber ku...
Bayê berbangê
Ji bihina te bû
Lewma...
Hişyarbûna sibehê
Hêmin û serxweş e
Ji ber ku...
Dengê bê ji dînbûna dil e
Lewma...
Semaya kulîlk û daran
Ewqas nazik e
Ji ber ku...
Xwena giyanekî evîndar î
Wê ûştê...
Ez û helbestê
Çîrokine payî ne
Ji ber ku...
Tu dilrevîna min î
Lewma...

Di newqa demê de
Dîn û mestê te ye dil

Carina dibim koçber û li sînorê stêrkên komika sêwiyan şûşeyên meraqan di peyala heyvê de vala dikim û mîna sermestekî yarwindayî dibim mîvanê berbangine ji rengê kenê keçên çardehsalî.

Her ku fincên meraqan hestan bi bask dikin, mîna bilbilekî ku ji bihna gulan serxweş e, dibim siwarê li pişta hespê nîgaşan û şivantiya xewnên evîndariyê dikim.

Êşên welatekî pirbirîn… Qurequra zikê sêwiyan û fêrmiskên dîlberan dikim nimêja hestan û di awirên sibehan de derdikim.

Di hemêza bajarê jînistanî de sibehên qeflok awirên ji çavên dîlbereke dilmest giyan germ dikin. Dibim mîna kewekî li destpêka Sibatê û sîngê min ji qebqeban şên dibe… Şev û roj dibin dîlana keçikên Çerkezan û ji rengê awirên yarê helbest der dibin.

Du roj di gewriya demê de rêketin, ya sisiyê ji bedewiya canistanê ramûsan diyarî xewnên çemê Efrînê dikirin û ji silavê pinpinîkên destê min ê rastê serxweş bûn. Nêrîneke xunavî gupikên evînê di

gulistana dilê de bişkuvandin… Siha dilrevînê bajar xiste dergûşa şahyeke buharî…

Dil, hest û giyan bûn dîlana keçikên Koçeran û nihrîn di nav mijangan de dîîîn dîn herikîn. Ji ken, awir, xweşikbûn, bedewî û nazdariya ferişteyî bêje, hevok, wêne û awazên helbestekê serxweş, serxweş û serxweş bûn.

Di kişwera hevdîtinê de
Di navika wî bajarî de
Di balkona heyvê de
Me dilopên baranê têr çêrandin
Agirê dil venemirî...
Di hemêza Avrêlê de
Li ber deriyê Çareşemeke dêmkenok
Di bin siha ewrekî têrxunav de
Dil dijenî... Giyan dikenî
Meraq hêsayî nebûn...

Eger dibêjim dilrevînê! Rengê hezar û yek kulîlkên ku hîn hingan lêvên wan nepelandine di guldana demê de bi hev dilîzin... Xwedêwendên evînê lêvên xwe gez dikin...

Her ku di siha mijangan de şahî di çavan de dîl dibe, ne tenê helbest û hest... Dînbûna salan û giyanê jî ji zindana keserê azad dibin.

**07. 03.2016**

## Derûnexweş

Got: Ez Xwedê me. Vêca di çar gav erd de hate binaxkirin.

Got: Ez menzitirîn serwer im. Vêca li qada bajêr kursiya wî bi destê zarokan hate şewitandin.

Got: Ez her tişt im. Hîngê têgeha ``netişt`` hate bilêvkirin.

Got: Ez qiralekî serkeftî me. Li pêşt xwe nihêrî keleya wî hildiweşî.

Gotin: Şûrê bapîrên me zikê jinên avis diqelaştin û zarokên wan dikirin xwerina segeyên xwe.

- Lema gora bapîrên we rojane ji mîza kûçikan tê avdan…!!!

Got: Ez hertim mîna Havînê bi ber im.

- Lewma tu serwerê welatekî payîzî yî û jiyana xelkê mîna dareke pelweşandî ye…!!!

Gotin: Em doza bihuştê û çel perwînan dikin… Em leşkerên Xwedê ne.

- Lewma hertim destên we ji xwîna mirovan sor in û bihuşta li dunyayê dişewitînin…!!!

## Ez Napeyivin… Lê

Ez napeyivim… Na napeyivim.

Lê…

Li welatê min nûçeyeke ku ji êşan dagirtî li ser zimanan digre: ``**Evîn û dilsozî nemane**``. Hey looo! Hey lêêê…! Dixwezin vê derewê bikin rastî û kirasê tinaziyan li rastiya me bigerînin.

Rast e; diz dikarin guharan ji guhên keçên çarpêncsalî bidizin… Dikarin gopalê kalemêrekî kor ji dest birevînin… Dikarin li minzgeftê nimêjê bikin û li derketinê solina bidizin… Dikarin şûşeyên gulavê ji çenteyên hin jinên ku bi zarokên xwe mijûl in bidizin û piştî çend gavan li erdê xînin û bişkînin… Dikarin lîstokan ji nav destên zarokên perîşanan birevînin ji zarokên xwe re bibin… Erêêê… Erê diz gelek in.

Rast e; di navbera diz û derewînan de hevbendiyên tariyê hene û hewil didin mûmên li ser maseyên xwendekaran vemrînin. Dilşadiya xwe di herikandina rondikên sêwiyan de bibînin û ji firehkirina goristanan re kêfxweşiya xwe diyar bikin.

Rast e; kuştin, lêdan û zîndan ji navnîşanên ferhenga roj û şevên vî welatî ne… Li erd û ezmên agir û

dûmana reş kêm nabe û hilma xwînê kulîlk û nêrgizan diçelmisîne.

Lê…

Evîna vê axê, ya vê şirûştê û ya van çiyayan ji giyan, dil û xwîna dilsozan netê dizîn. Di dilê her zinarekî de, di nav lêvên geliyan de û sîngê her sirtekê de çîrokên evînê bi pertavên rojê hatine ristin û hûnandin…

Erêêê erê bihina vê axê ji ya giyanê bapîrên me yên jiyanhez e… Çavên me gelek tabloyên rengxwînî û darbestên sêwî û hêlûnên ku hatine şewitandin jî dîtine… Lê navika me ji vê axê û vî welatî nehatiye birîn. Ji memikên çiyayên xwe yên enîbilind me têêêr û têr evîn mêtiye. Gelo evîdarî û dildariya di navbera damarên daran û axê de tê dizîn? NA.

Dilsoziya me ji vê axê re ne jidayîkbûna roj û şevekê ye… Ne wek çîroka evîna Zuleyxa û Yûsif e… Ne wek zîldana bijoniya di nav zeviyên gênim de ye… NA.

Gelek lehî hatin, lê çiyayên ku em bi evîndariya xwe mjandine noq nebûn û nabin… Gelek caran agirên mezin di newqên welatê me vêxistin, lê axa ku bi xwîna pêxember û pakrewanên azadî û aştiyê hatiye xelatkirin neşewitî û naşewite.

Nûçeya ku li ser zimanê diz û derewînan: ``**Evîn û dilsozî nemane**``. Bila li bazarên riswabûna xwe bifroşin hev.

Ma qey rûpelên dîrokê di berîka pêriyeke dîn de yan di zikê masiyê Mûsa de hatiye veşartin?! Berê jî şûr di malzaroktiya jinên ducanî de dadiçikandin û rihên xwe yên dirêj bi xwîna zarokên şeşmehî hene dikirin. Çîroka şerê di nabvera ronahî û tariyê de bê dawî ye û hertim şevşevok -perçemok- evîndarên tariyê ne.

Nexşeyên rengxwînî ne şopine demkî ne. Dixwestin gîsinê hebûna me ji nav vê axê derînin û di gewriya perîşaniyê de zîldana me hişk bikin. Lê tucarî me mirov derbasî ser sifreyên ku goştê zarokên wan li ser e nekirine. Ne ji karê siwarên ronahiyê ye ku mirovan bikujin, belkî di rûvikên wan de perçek zêr bibînin.

Peymanên dilsoziyê li ser qûmê nîgar nabin… Yên bi ava kaniyên ku ji dilê zinaran û sîngê çiyan tîbûna xwe dişkînin û yên ku deveyan serjêdikin û ava di zikê wan de vedixwin ne mîna hev in, wek avê û êgir in. Agir ter û hişk dişewitîne û dîroka wî xalî ye. Av êgir vedimirîne û jiyanê peyda dike.

Ez napeyivim… Na napeyivim

Lê…

Li vê cîhanê hertim şer û ceng e. Bi hemû awa û çekan mirov hev dikujin. Hevdû dişewitînin û nav li wê hovîtiyê dikin ``**serkeftin**``!

Li vê cîhanê çem û kaniyan ji bihna xwîna mirovan sor dikin û laşê mirovan dibin xwerina goştxwerên têr û birçî… Zikê deşt û çiyan ji termên mirovan têr avis dikin û nîvê daristanan ji hev re dikin darbest… Li vê cîhanê nişkekuştina hev dikin û dibêjin: **Em doza jiyaneke baş û xweş dikin**!

Ji dest kiryarên mirovan… Erêêê erê mirovên ku xwîna wan ji mirovatiyê rijî ye siberoja mirovahiyê berve ne diyariyeke tarî diçe. Hûn dizanin ku qijik goştê hevdû naxwin?

Berî ku biçim gorê û bibin xwerina kurman, xwezî estiyên min ji perîşanên bê mal re bibin holik û wan ji sermeya zivistanê biparêzin.

Qurşîna ku ez ji xwe re kirime armanc, bila şaş bike û li ser latekî bêdeng bikeve, Bê dudilî ezê xwîna xwe ji zarokên ku li nexweşxaneyan birîndar in re bikim diyarî û hîngê mirina min ne şaş e.

Ez napeyivim… Na napeyivim

Lê…

Her ku sedsalek konê xwe dipêçe, di nav wê pêçandinê de gelek tiştên baş bi xwe re dibe û tiştine ne baş ji sedsala li pey xwe re dihêle.

Cihê tên guhartin, lê dem wek xwe dimîne û carina jî cih û dem bi hev re birînên ku sedsalên borî li pey xwe hîştine derman dikin.

Mirov hertim hewil dide cihan li gor pêşketina mejiyê xwe biguhêre û arîşeyên xwînî dest pê dikin. Navnîşana piraniya wan arîşeyan li gelek cihan girên ji qafên mirovan çêdibin. Şoreş… Erê nav lê dikin şoreş! Gelo ``şor û reş`` di hev de vedan û bûne ``şoreş``? Çêja xwînê şor e û kuştina mirovan karekî reş e. Belkî şaş be, lê bapîrê min digot:

**- Gotina ``belkî`` ne yek e**.

Mirov pişta xwe da şikeftên Karistî û beza li pey nêçîrê kêm kir. Ji axê xanî avadibin… Bi xaniyan gund avadibin… Gund fireh û mezin dibin û bajar jê peyda dibin… Mejî û pêşketina mejî rastiya mirov e. Gelo li ser girên ji term û qafên mirovan jî bajar ava dibin? Erê temenê nazîperestiyê kin bû, lê têra xwe xwîna mirovan herikand.

Hertim li hember mejiyê ku doza pêşketinê dike, mejiyekî kor ku doza tariyê dike hêza xwe û dibêje: Ez jî heme.

Dibêjin: **Mirov bi sinca xwe mirov e**. Ev gotin beşek ji rastiyê ye. Lê hin dibêjin:

**-** Ol stûnê bingeh ji sinca mirov e û piştre hiş, zanîn û dilovanî asta sincê bilind dikin.

Ez napeyivim… Na napeyivim, lê divê rastî netê badan û tinaz bi hişê mirov nebin. Hiş û zanîn bingeha her tiştên rast û hêvanê jiyanê ne.

# Naverok


| | |
|---|---|
| - Pêşgotin | 3 |
| - Mirov Dem û Jiyan e | 7 |
| - Van Çavan Çi Nedîtin...! | 17 |
| - Mirov Seyr e Iooo! | 31 |
| - Em Ji Afrandina Rewşên Xwe ne | 35 |
| - Pirs û Xwîn? | 40 |
| - Mirin | 47 |
| - Siha Welatekî | 49 |
| - Pesin û Lêborîn | 50 |
| - Siruşt | 53 |
| - Gulistan Bi Rengên Xwe Dixemile | 55 |
| - Dilsoziya Lawên Rojê | 58 |
| - Penabername | 65 |
| - Pêlvedana Ronîperestan | 68 |
| - Rastî | 71 |
| - Hawarên Evîndarekî | 74 |
| - Elend û Baran | 81 |
| - Helbest û Melbest | 87 |
| - Çîrok | 90 |
| - Pênûs | 93 |
| - Darbest Ne Welat in | 95 |
| - Pirsine Xemgîn | 97 |
| - Ji Bo Çi Pirs? | 101 |
| - Barînine Evînî | 103 |
| - Xwedêwendên Hestan | 113 |
| - Nameyek | 114 |
| - Ez û Helbestê | 116 |
| - Derûnexweş | 122 |

- Ez Napeyivim… Lê 123
- Naverok 129